



Furûxa tenha

Risteyên Furûx Feruhzadeyê, wekî tevî riste û hevokên wê pêldarî û tofanên deryaya hebûnê tînin bîra mirov. Lê ruhek, jinek, mirovek, çemek karibûye wiha ji ber tevî mirov û gerdûnê ve ji tofanan bijî? Ev jina çeleng a ku pir kêr li vê gerdûnê maye... *Mizgin Ronak / R.2*



Berxwedan ziman e!

21'ê Sibatê roja navneteweyî ya zimanê dayikê ye. Lê belê ne ya hemû zimanan. Tenê gelên zimanbîndest an jî hinek ji wan vê rojê pîroz dikin. Lixwedîderketina zimanekî dibe kul û derd tenê wexta ew ziman di bin xetereya windabûnê de be, an jî qedexe be... *Şerîf Derince / R.5*



Hecî Şerîfa

Me go em seriyekî bidin dostên xwe yê qedîm. Ew çûbûn aliye din, zaroyên wan mabûn. Me silav da Brahîmê Corc. Mêrdinê xweş Mêrdinê, şîşik kebabên wê, soqilbeqer û zêrkerên wê qedîm, qedîrnas, cansivik, devbikên û xwedî he-wayek nenas, ango mîtolojîk... *Feratê Dengîzî / R.11*

Rojnameya Heftane

www.xwebun.org

xwebûn

17-23 Sibat 2020

Hejmar: 9

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

Neheqî li vî zarê zêrîn bûne



Zimannas Husein Muhammed têkildarî 21'ê Sibatê Roja Zimanê dayikê ji rojnameya me re axivî û got ku divê kurd seranserê salê bo zimanê xwe bixebitin. Muhammed da zanîn ku di raboriyê de neheqiyên mezin li vî zarê zêrîn bûne û divê kurd vê nekin hincet û mafê xwe yê rewa bixwazin...

Hevpeyvîna Zekî Gurur / Rûpel - 4

Wêneyê Biroyê Heskê Têlî

Carekê dema min li nivîseke ku di kovarekê de derketibû mêze dikir li wir çavên min çûn li wêneyekî asê bûn û min baweriya xwe bi çavên xwe neanî! Di wêneyê de du kesên çekdar ku piştî xwe spartibûn berpalên Çîyayê Agiriyê xuya dikirin...

Rohat Alakom / R.12



Îdlîb peynîyê xeyalan o

Hesabê zaf dewletan ser Sûriye bibî. Çek û cebîlxane û lojîstîkê çeteyan heme ser Tirkîya ra şî. Encamê bazariyê lişinan de dewleta rûs bêbextî ro kurdan kerde. Dewleta tirk zana ke heke Îdlîb dest ra vecîyo do peynî ro heme xay-alanê înan bêro. Dewleta tirk vîna ke bê destûrê dewleta rûs nêşikena Sûriye de xo têbida. Mecbûr mende xo bida kiştê dewleta rûs. Bêguman eno ro hesabê dewleta rûsî ke ameyê. Badê ke dewleta tirk û dewleta rûs... *Mehmet Şahîn / R.9*

Di xewna xwe de diçe gund û nav bîstan

Li bakurê Kurdistanê, di salên 1990'î de gelek gund hatin şewitandin. Ji ber vê şewitandinê bi hezaran mirov ji cih û warên xwe bûn. Niha jî bi sedan gund di bin bendava Heskîfê de dimînin û dîsa gundî koçber dibin. Gundên ku di salên 1990'î de hatin şewitandin niha di binê avê de di-

mînin. Zeynep İder (68) a ji gundê Ewtê yê navçeya Misircê ya Sêrtê wiha got: "Hema bêje her şev gund tê xewna min. Beriya du rojan jî di xewna xwe de ez li Ewtê bûm. Di xewna xwe de ez û birayê xwe di nav bîstan de, me tiriyên taîfî berhev dikirin."... *RÛPEL - 3*



Wekî berxê li ber maka xwe

Nêçîrvanên dengên kurdî vê carê jî li pey dengbêjê ciwan Murat Akbaşlı ketine. Murat wekî berxikê li ber maka xwe li gund xwe diparêze. Ew jî li bendê ne ku ji refê xwe dûr bikeve... *Veysî Varlı / R.11*

Hunermend ji bo yekitiyê dixebitin

Ji bo avakirina yekitiya neteweyî jî hêla hunermendên kurd ve li başûrê Kurdistanê Platforma Hunermendan hat avakirin. Hunermend dixwazîn erka xwe pêk binîn, daxwazên hunermendan bikin yek û bibin dengê gelê xwe. Hunermend Niyar Ebdullah wiha got: "Gelek girîng e ku dengê hunermendên jin di vê hewldana yekitiyê de bilind bibe. Hunermend dikarin xizmetê ji yekitiyê re bikin..." *RÛPEL - 6*

Zehra Mohammedzadeh
Dîroka nixumandî
Rûpel - 2

Selîm Temo
Veger
Rûpel - 8

Ayhan Erkmen
Gundê Yemençayîrê
Rûpel - 8

Cemîl Oguz
Xêzê reyan...
Rûpel - 9

Her hefte 'Bê henek'

Şanoger Gulbîn Bozan û Rabîa Heybetoglu bi navê Bê Henek listîkên şanoyê çêdikin û li ser medya civakî diweşînin. Heftê listîkeke xwe diweşînin û ji bo weşandina listîkê jî roja sêşemê hîlbertine. Armanca wan a bîngêhîn nîşandana hebûn û geşkirina zimanê kurdî ye... *RÛPEL - 3*



Rêbaza bêiradekirina jinan; sinetkirin

Sinetkirina jinan bêyî ku pêwîstî bi mudexaleya tîbbî hebe, beşek an jî bi temamî girtina vajînayê ye. Armanç bi temamî bêhestkirina jinan û kontrolkirina bedena wan e

Navenda Nûçeyan

Sinetkirina jinan, tevî ku li dehan welatan hatiye qedexekirin, hîn jî gefê li milyonan zarok û jinên ciwan dixwe.

Ev 'kevneşopiya' ku tê payîn 2 hezar û 500 sal berê li Misirê destpê kiriye, başûrê Kurdistanê jî di nav de hîn li gelek welatên Afrîka, Asya û Rojhilata Navîn dewam dike. Sinet her sal herî kêm li ser 3 milyon keçan gef e. Li gorî daneyên Rêxistina Tenduristiyê ya Cihanê (WHO) 200 milyon jin, zarokên keç hatine sinetkirin û hîn bi milyonan zarokên keç bi sinetkirinê re rûbirû ne.

Sinetkirin ku hewldanek ji bo 'kontrolkirina zayendî ya jinê' ye, bi giranî di nav civakên ku sinetkirina jinan tê kirin de wek nîşaneyêke namûsê tê dîtîn.

Xerakirina genîtal

Sinetkirina jinan ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY), rêxistinên tenduristî yê cihanê û gelek dewletan ve wek xerakirina genîtal tê binavkirin, her sal dibe sedema mirina gelek jin û zarokên keç.

Sinetkirina jinan bêyî ku pêwîstî bi mudexaleya tîbbî hebe, beşek an jî bi temamî girtina vajînayê ye. Armanç bi temamî bêhestkirina jinan û kontrolkirina bedena jinan e.

Lê tiştê herî bi eş, ev rituela teslîmgirtina bedena jinan ku ji ber hişmendiya mêran pêk tê, bi destê jinan tê kirin. Herî zêde ji bo domandina vî tiştî jin li ber xwe didin. Yanî jin ji aliyê mêrê desthilatdar ve bi destê jinê tê xistin.

Her sal hejmar zêde dibe

Yemen, başûrê Kurdistanê û Misir jî di nav de, li welatên Rojhilata Navîn û 30 welatên li Afrîkayê bi giranî keç beriya 15 saliya xwe tînin sinetkirin. Tê texmînkirin ku rêjeya jinên li Misirê û Maliyê hatine sinetkirin li derdora jî sedî 90 e. Li Somali, Erître, Sûdan, Gîne, Sierra Leone û Cibûti jî rêjeya jinên tînin sinetkirin zêde ye.

Li cihanê jî bo rawestandina sineta jinan 6'ê sibata wek Li dijî Sinetkirina Jinan Roja Toleransa Sifir a Navneteweyî tê qebûlkirin. Armanca vê rojê li cihanê bi taybetî di nav civakên ku jin tînin sinetkirin de avakirina hestiyariyê ye. Lê tevî vê yekê jî her sal di sinetkirina jinan de zêdebûnek

heye.

Herî dawî hefteyek berê WHO'yê têkildarî mijarê daxuyanîyek dabû û diyar kiribû ku her sal hejmara sinetkirina jinan zêde dibe.

Bi cezayan pêşî lê nayê girtin

Tenê ne welatên Afrîkayê, Asya û Rojhilata Navîn li welatên Ewropayê jî tevî cezayên

giran û pereyan bi hezaran jin û zarokên keç hatin sinetkirin û gefa li wan tê xwarin.

Ev yek jî nîşan dide ku ev pirsgrîk ne tenê pirsgrîka herêmekê ye an jî parzemînekê ye, ev pirsgrîk ya hemû cihanê ye. Heta ne tenê ya jinan e jî. Ji bo rakirina vê rituelê ku wek çandek tê qebûlkirin, armanç di şexsê jinan de xistina hemû civakê ye. Ji ber vê jî divê mêr û jin bi hev re têbikoşin.

Lê tabî beriya her tiştî divê hemû jinên cihanê ji kîjan statuyê dibe bila bibe, li dijî her cure tundiya ku li ser jinan tê kirin, bibin yek û têbikoşin. Civak encax dikarin bi vî awayî ji pergalên serdestan rizgar bibin û li xwe vegerin.



Furûxa tenha

Mizgîn Ronak

“We in menem/zerî tenha/ der astaneyî feli serd/deriptûdayî derki hestî alûdeyî zemîn/ weyesî sadewu xemnaki asîman/ we natewaniyî in desthayî sîmanî” û “ez im, jinek tenha/li ber deriyê demsala sar a ku hewl dide hebûna ku tev li erdê bûye fêm bike/û neçariya asîman a sade û xembar/û bêhêziya van destên jî çimentoyê.”

Van rîsteyên Furûx Feruhzadeyê, wekî tevî rîste û hevokên wê pêldarî û tofanên deryaya hebûnê tînin bîra mirov. Lê ruhek, jinek, mirovek, çemek karibûye wiha ji ber tevî mirov û gerdûnê ve ji tofanan bijî?

Ev jina çeleng a ku pir kêm li ve gerdûnê maye, wisa kûr jiyaye ku derya hê jî bi bagerên ruhê wê pêlpêlî dibin û firtoneyên xwe tîr dikin. Jixwe tenhatiya wê agirê gur e, qet venamire. Lew di nav malbatê de jî di welatê xwe û cihanê de jî tenha ye ew, tenê û bê dost û destek. Loma jî wekî xwekustîne dijî, bi dil û bîrek xwekuj dijî. An jî najî, nikare bijî ji ber astengiyên dewlet û civaka nêrza. /Kodam qûle kodam owc/meger tenamiyî in rahayî pêçapêç/der an dehanî serdî mehende/be noçteyê telaqiyu payan nemî nesend? “Kîjan diyar kîjan bendav e/hemî van rêyên ku xwe li hev dipêçin/nagihîjin hev di wî devê sar û mijok de/li xala gihîştinê?”

Tevî ku bi lezgîni jî hewl didim wergerînim/zimezîma giyan û baskên wê tê me newisa? Li Îrana ku hê jî kujerê jin, ciwan, kal, pîr û gelan e, Furûx û helbestên xwe hem li ber xwe didin, hem jî her roj bi sêdar û gulebaranan tînin kuştin. Ew ‘jina tenha’ hê jî tenha ye lê nasekine. Her tîpek helbestên wê dibe çîrokek, her çîrok êdî rastî ye, wekî salek nexîşandi li dor stûyê tevî ‘tenhayan’ e. “Men razî felsihana mî danem/we hergî lehzeha ra mî guhrem” “Ez sira-raza demsalan dizanim/û gotîna lehzeyan-kêliyan fêm dikim.” Helbet tu fêm dikî Furûx, helbesta me ya bêdawî ye! An na te yê wiha nexwenda di dilê her demsalê de. Asîmanê ku tu behs dikî, demsalên ku tu bi ‘raza wan’ dizanî hê jî didim. Wekî birûskên şevêk tarî li bin guhên hev diqelibin. Lê tu dengê xwe yê ‘tenha’ nabirî û her dixwîni.

“Şîbiha, hemçûn enbûhî ezadaran/lehzeyî barîden ra guwî muntezîrend” “Ewr, wek qefleya şîniyan/ li benda wexta barîne ne.” Rast e, ewr hê jî tîjî ne bi baranê, hê li ser serê me, diltîje û çavreş. Lê em ê qet huzûr û meydanê ji kujerên te re nehêlin û ewrên te yê reş ji ser serê wan kêm nekin. Tu bixwîne her hebe, wiha ‘tenha’ li gel me be!

Dengê ku ji her sedsalekê olan daye û ber bi sedsaleke din ve herikiye, dengê wan jinan e ku ji jinên îroyîn re rê nîşan daye. Ger ji aliyê pergala serdest ve hatibe xwestin li ser rastiya dîroki ya jinê bê nixumandin jî, lê vî dengî di sa bi awayekî reşahî qelîşandiye û xwe gihandiye me.

Di dîrok û qirnên cuda de û nexasim jî ber çanda eşîrî û mîrîti ya di nav kurdan de hakim bû, civaka kurd di nav xwe de girtî û bandora feodalîzmê jî li ser zêde bû. Jixwe di qir-nên 18-19'an de civaka kurd bi gelemperî wek komên eşîrî, mîrîti, koçer û nebajarî, an jî niv bajarî dijîn. Vê rewşê her çend bandorek neyînî li ser rol û cihê jinê yê di nav civakê de kiribe jî, lê nekariye bi giştî jinê di nav rastiya civakî de veder bike. Jixwe em di gelek mînakên xebat û tîkoşîna jinê ku em di sedsalên cihê de lê rast tînin, dibînin ku jin hîn hêza xwe bi gelemperî ji dest nedaye û hîn rola wê diyarker e.

Jixwe jî ber şerê di navbera şahenşahiya Îran û Osmaniyên de kurd her tim di navbera wan her du desthilatdaran de mane û ger -dem bi dem bi daxwaza xwe be jî- lê bi gelemperî li gor berjewendiyên wan



Zehra Mohammedzadeh

Dîroka nixumandî

hêzan hatine mişextkirin, yan jî bi darê zorê ew koçê herêmên cuda hatine kirin. Bêguman vî rewşê jî herî zêde bandor li jinan kiriye. Zor û zehmetî, mirinên di encama van koçan de rû dane, çewisandin û dest-dirêjiya hêzên desthilatdar bi xwe re encam û eşên mezin anîne.

Nexasim di dema Şah Ebbas de gelek eşîrên kurd tînin koçberkirin. Di encama koça mezin de eşîra Şatiranlû (ku li gor agahiyên Zekî Beg, ev eşîr girêdayî konfederasyona Caf e) jî tê koçkirin. Di dema Mehemed Eli Şah Qaçar (1907-1909) de rêveberiya eşîra Şatiranlû di dest jina bi navê Azamet Xanûma Şatiranlû de ye. Di bin rêveberiya vî jina kurd de, ji bo parastina Mîrza Kuçexanê Cengelî, li dijî mêtîngeriya îngilîz-rûsan serî radike. Di encama vî serhildanê de bajarê Xalxalê bidest dixê û 20 salan li vir hikûm dikin. Rîza Xan di sala 1923'yan de, bi hêzeke

mezîna a qazak êrîşî vî bajarî dike û Azamet Xanûm jî di nav de, hemû pêşengên eşîra Şatiranlû (ku tê gotin gelek jinên din jî di vî serhildanê de cih girtine) tînin girtin, dibin Tebrîzê û gelek ji wan darve dikin.

Helbet gelek jin beşdarî vî serhildanê dibin; yek ji wan jinan jî Heybet Cengelî ye ku li daristanên Siyahkol û Dilman şer dike. Ev jin ne tenê wek alîkarên zîlam an jî di tiştên rojane de ji wan re dibin alîkar, belkî her yek jî jinên Şatiranlû bi awayekî çalak beşdarî vî serhildanê dibe. Di demeke kin de nav û dengê wan li herêma Gilanê belav dibe.

Di sa qala jina bi navê Tofegul tê kirin ku di salên 1909'an de, piştî serhildana 11 salan a jî aliyê hevserê wê Êwez Xan ve hatibû destpêkirin, serhildanê birêve dibe. Yanî di vir de jî em dibînin, jin qeyd û bendên heyî tu caran nepejirandin û di her pêvajoyekê de bi awayekî dengê xwe bi-

lind kiriye, roleke girîng di rêvebirin û serhildanên kurdan de jî listîye.

A rast jinên rojhilatê Kurdistanê ne tenê di şer de, jî hêla raman ve jî bandorek wan a zêde hebûye. Nema di serdema Qaçar (Îran) de, jin berde derkeve nav civata zîlam û biavixê, nedikarî bî “hicab” û bi tena serê xwe derkeve derve jî. Lê, wê jina kurd a Qezwîni ya bi navê Tahire di 1848'an de derbiketa û banga wekhevîya jin û zîlam bikira. Tahire, ango Quretul Eyîn yek ji pêşeng û rêbera bawerîya Babî bû.

Di dema hikûmranîya Qaçar (1304-1164) de derfetên ji bo perwerdeya jinê pir bi sînor in. Jixwe xwendin û nivîsandina jinê li gor wan li dijî îslamê û ji civakê re jî xeter bû. Tahire ne tenê li dijî pîrzewacî, di heman demê de li dijî “sîxe” û xwepêçana jinan jî derdiket. Wê nêzikatiya li dijî jinê jî wek nêzikatiyek dijîmîrovî dinirxand.

Ew li ser mijarên zanîsta îslam, hiqûq, wêje û felsefeyê difikire. Di 19 saliya xwe de berhemên şex Ehmed Ehsayî ku damezrînerê bawerîya Babî bû dixwîne û piştê vî baweriyê jî nû ve şîrove dike, bi pêş dixîne. Li ruxmê nêzikatiyên paşverû, qedexeyên ku ji bo jinan hatine

danîn, ew civînan li dar dixîne, diaxive û bi axaftinên xwe herkesê bandor dike. Di civînekê de wiha bang li zilaman dike: “Hûn çawa dikarin li hemberî hev û xwişkên xwe zordariyê bikin.” Piştî ew fikra nû, şifî û gelek zanyarên dinî yê dijber, dest bi dijberîya wê dikin. Di pêvajoyekê de ku ji bo jinan axaftin qedexê bû, wê bi alimên dinî re nîqaşên dûr û dirêj dikirin.

Gelek pisporên rojhilatnas jî qala mezinahiya wê dikin. Yek ji wan dîroknasê îraqî Elî El-Werdî ye ku gotibû: “Tahire zana bû, bi sed salan li pêş serdema xwe bû. Ger Tahire sed sal derengtir derketibûna, wê bibûna hêjartîrîna jina sedsala bîstan.”

Belê, ger dîroka ku bi hişmendiya zîlam û pergala wî ya serdest hatiye nivîsîn deng û tîkoşîna jinê jî nedîtî bî jî, em ê rê nedin ve yekê û rûpoşa li ser wê rastiye bidin alî. Ji ber ku heya em rastiya dîroki ya jinên Rojhilat nizanibin, em ê nikarin têbikoşin. Ji ber ku ya pergala serdest a zîlam bi dengê bilind diqire û dixwaze em jî pê bawer bikin, dîrokek bêtîkoşîna û berxwedana jinên kurd ên rojhilatê Kurdistanê ye. Heya em paşeroja xwe dernexin ber ronahiyê, ew ê pêşeroja me ronî nebe.

'Bê Henek' zimanê kurdî geş dike!

Şanoger Gulbîn Bozan û Rabîa Heybetoglû bi navê Bê Henek lîstîkên şanoyê çidîkin û li ser medyaya civakî diweşînin. Bozan, diyar kir ku armanca wan a lîstîkan geşkirina zimanê kurdî ye

Qedri Esen

Di salên dawîn de weke her gelfî kurdî jî ji teknolojiyê sîd werdigirin û pê gelek xebatan dikin. Bi taybetî jî amûrên teknolojîk ên ragihandinê jî xwe re bi kar tînin û bi vî yekê astengiyên li pêşiya xwe jî holê radikin. Hunermendên kurdî vî yekê mijarê de afirîner in û li ser medyaya civakî, bi serêşandekê zêde xebatên balkêş hildiberînin.

Hunermendan bi van xebatên xwe yê balkêş, pirsgerîka cih û demê rakirine û xwe digihînin girseyeke mezin. Şanoger Gulbîn Bozan û Rabîa Heybetoglû bi navê "Bê Henek" serî li vî rêbazê dane û bêtî ku biçin eywaneke şanoyê lîstîkan amade dikin û li ser medyaya civakî diweşînin. Heftê lîstîkeke xwe diweşînin û jî bo weşandina lîstîkê jî roja sêşemê hilbjartine. Armanca wan a bîngêhînişandana hebûn û geşkirina zimanê kurdî ye.

Em bi Gulbîn Bozan re hatin gel hev û li ser Bê Henekê axivîn. Bozan, diyar kir ku Rabîa Heybetoglû re di navbera salên 2009 û 2013'an de li Akademiya Cegerxwîn perwerdeya şanoyê dîtine û wiha got: "Piştî ku me perwerdeya xwe ya li akademiya bi dawî kir jî terka xebatên çandî û hunerî nekir. Me xebatê jî xwe re kir derd û hewl da ku gelek tişt binivîsînin. Me herî dawî biryar da ku xebata Bê Henek



bikin. Di meha çileyê vî salê de me dest bi vî xebata xwe kir."

Nîşana hebûna kurdî ne

Li ser pîrsa ku Bê Henek kî ne Bozan, da zanîn ku Bê Henek kes nînin, fikrek e û ev tişt got: "Fikrek ku di dilê gelek kesê de hebû, me jî xwest em jî vî tiştî derxin holê. Bê Henek dilxwaziya gelek kesan e." Bozan, tîkildarî armanca Bê Henek jî ev tişt anîn ziman: "Propagandayê neyînî li ser zimanê kurdî çêdibe. Hinek kes jî zimanê kurdî re emir diyar dikin. Dibêjin ku dê heta 10-20 salan zimanê kurdî wînda bibe û biqede. Dema ku min û Rabîayê van tespîtan bihîst, me jî xwê got, 'Bila me bikin muze-yekê. Lewre em tenê mane'. Lê

rastî wiha nîne em û derdora xwe bi kurmançî xeber didin. Ji sedî 100 jiyana me bi kurmançî ye. Me bi vî xebata xwe xwest ku em nîşan bidin hê kurdî heye. Armanca me ya sereke jînkirina zimanê kurdî ye."

Eywana şanoyê pêwîst nîne

Di berdewamê de Bozan derbarê naveroka lîstîkên wan de jî axivî û diyar kir ku bi mîzahê nêzîkî mijaran dibin û wiha berdewam kir: "Mijara me sosyolojîya civaka me ye. Em dayik, pîr û meta xwe dilîzin. Ên ku me temaşê dikin dikenin lê di bîngêha lîstîkên me de îroniyek heye. Erê lîstîk henek e lê di bîngêha xwe de Bê Henek e. Bê henek, weke beşeke xebata me ye. Wê xebat li ser me her du kesan bi-

meşe. Niha em li ser du jinan dixebitin. Em ê tîra xwe van her du jinan biguvêşin. Çi derkeve holê em bikin lîstîk. Lê beşên me yê dinê jî hene. Ji bo van xebatên me jî kîjan qarekter pêwîst be, em ê bikewin wan qarekteran."

Bozan, destnîşan kir ku lîstîkên xwe li derveyî ewyana şanoyê dikişînin û wiha pê de çû: "Me heta niha 10 beşan li Almaniyayê kişandîye. Li gorî derfetan dibê ku em mekanê lîstîkên xwe biguherînin. Ji bo ku mirov şano bike ewyana şanoyê pêwîst nîne. Niha derfetan me ev in, em jî li gorî van derfetan xwe tevdigerin. Heke di pêşerojê de derfetan me çêbibin dikarin li eywaneke şanoyê jî lîstîkan çêbikin."

Di rêya rast de ne!

Di dawiyê de Bozan bal kişand ser bertekên ji bo lîstîkên wan û axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Vegerek baş heye. Ji rojava, bakur û başûrê Kurdistanê mirov li me vedigerin û şiroveyên xwe dikin. Kesên ku li me vedigerin dibêjin ku dema em we temaşê dikin em xatî û metên xwe di we de dibînin. Mirov bi hesreta kurmançî ne. Dixwazin tişteki kurmançî hebe û jî xwe re pê mijûl bibin. Em gelek kêfxweş dibin ku gelê xwe bi zimanê wî didin mijûlkirin. Ger em bi kurdî bixebitin dê kurdî nemire. Ev bertek jî nîşanê me didin ku em di rêya rast de ne."

Fêrî zaravayê soranî dibin

Navenda Nûçeyan

Li bakurê Kurdistanê jî ber ku perwerdeya bi kurdî qedexeyê ye, jî salên 2000'î ve bi qursan dersên kurdî tînin dayîn. Ji bo vî yekê navend û angokomeleyên ku van qursan bidin hatin vekirin. Ji bo xebat û fêrkirina kurdî destpêkê Komeleya Lêkolîn û Pêşvebirina Zimanê Kurdî (KURDÎ-DER) hat vekirin. KURDÎ-DER heta sala 2016'an bi hezaran kesî fêrî kurdî kirin. Piştî ewqas ked û zehmetî, di sala 2016'an de KURDÎ-DER bi KHK'ek hat girtin û pêşî li gelek xebatên kurdî hat girtin. Piştî re bi dehan sazî û dezgehên ku li ser kurdî dixebitînin û xizmet didan jî hatin girtin.

Ders hefteyê rojek e

Di meha sibata sala 2018'an de jî bo ku li Amedê qursên kurdî careke din bînin dayîn, jî aliyê hin mamoste û xebatkarên zimanê kurdî ve Komeleya Lêkolîna Çand û Ziman a Mezopotamyayê

(MED-DER) hat avakirin. Komele jî sala 2018'an ve li Amedê bi zaravayên kurdî; kurmançî û kirmançî qursan dide.

Komeleyê beriya 6 hefteyan-dersa zaravayê soranî jî li qursên xwe zêde kir û niha bi beşdarîya 20 kesan dîrsa soranî jî li komeleyê tînin dayîn. Axlêbeya van kesan mamosteyên kurmançî, rojnamevan û xwendekar û mamosteyên zanîngêhê ne. Ders hefteyê rojek bi 2 saetan e.

Bi alfabe-yê dest pê kirine

Em li komeleyê bi mamosteyê zaravayê soranî Ramîn Rebi'î re hatin gel hev û tîkildarî fêrkirina soranî ya li bakurê Kurdistanê pê re axivîn. Rebi'î, bi kurtasî behsa kar û barên xwe kirin û der barê dîrsa soranî de bi rojnameya me re agahî parve kirin.

Li bakurê Kurdistanê alfabe-yê latînî tînin bikaranîn, lê dîrsa soranî ya li komeleyê bi alfabe-yê aramî ye. Rebi'î tîkildarî dîrsa soranî ya bi alfabe-yê aramî diyar kir ku wan bi alfabe-yê dest bi dîrsa xwe kiriyê û

sê hefte li ser alfabe-yê xebitîne û wiha got; "Li gorî min pêwîst e ku kurdek herdu alfabe-yan jî bizanibe. Li gorî min xweş e ku alfabe-yê soranî were hînkirin ku em bizanîbin ka Ehemêdê Xanî çawa nivîsandîye û dikarin berhemên klasîk ên wêjeyê bixwînin. Ji ber vî me biryar da ku em dersê bi alfabe-yê aramî bidin."

Eleqeya xwendekaran baş e

Mamoste Rebi'î, destnîşan kir ku piştî fêrkirina alfabe-yê, dê dîrsa xwe bi rêziman û mijarên wêjeyî bidomînin û ev tişt anîn ziman: "Hînkera soranî ya yekemîn derketiye lê negihîştîye destê me. Em ê li gorî hînkereyê biçin, dewreyê hînkera yekemîn e. Heta wê çaxê ew ê hînkereyê din jî derkevin; asta duyemîn û sêyemîn."

Rebi'î, bi lêv kir ku eleqeya hin xwendekarên wî jî bo soranî baş e û ew bi wan bawer e ku dê karibin di demên pêş de bigihîjin wê astê ku bibin perwerdekarê zaravayê soranî û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji ber hîna haya gelek kesan jî vekirina qursa soranî çêbûye, niha xwendekarên me tenê 20 kes in. Ez bawer im, di demên pêş de dê hejmarê xwendekarên me zêde bibe."

Her du alfabe-yê jî pêwîst in

Di berdewama axaftina xwe de Rebi'î, jî bilî mijarên qursa soranî, qala nîqaşên kurdan ên li ser alfabe-yê latînî û aramî jî kir û herî dawî



der barê mijarê de ev tişt gotin: "Bikaranîna alfabe-yê cuda pirsgerîk e. Herdu alfabe-yê jî tîra axaftina bi zaravayên kurdî nakin. Mesela di alfabe-yê latînî de hinek tîp tune ne. Erê rast e ev piranî jî erebî hatine lê tîra bikaranîn. Ev rewş di aramî de hinek baştir e lê mesela di aramî de jî tîpa dengdêra kin'î tune ye. Hem li Başûr hem jî li Bakur berhemên ku bînin veguhas-tin pir in. Ji ber vî jî bi rastî ne tişteki zehmet e ku saziyên ziman hewl bidin herdu alfabe-yan jî bidin fêrkirin. Hê jî li Rojava gelek kes bi alfabe-yê aramî dinivîsin."

Ramîn Rebi'î kî ye?

Ramîn Rebi'î jî bajarê Mahabadê yê rojhilatê Kurdistanê ye. Li Rojhilatê jî beşa endezyariya mekîneyê ya zankoyê derçûye. Piştî zan-koyê li akademiya taybet a muzîkê perwerdeya muzîkê dibîne. Di heman demê de bi salan endamtiya odeya wêjeyê ya li Mahabadê dike ku di bin banê Wezaretê Çandê ya Îranê de ye. Rebi'î 4 sal û niv e li Amedê ye û li Konservatûra Aram Tigran, Zarok TV xebatên muzîkê bi rê ve birine. Niha jî li MA Muzîkê perwerdeya muzîkê û li MED-DERê jî dîrsa soranî dide.

Bendavê destê wê jî gundê wê kir

Navenda Nûçeyan

Li bakurê Kurdistanê, di salên 1990'î de gelek gund hatin şewitandin û bi hezaran mirov jî cih û warên xwe bûn. Ji ber ku ev jî kurdan re bes nehat dîtin, bi heman armançê bendav jî hatin çêkirin. Yek jî van bendavan jî Bendava Îlisûyê ye. Tevî bertek û nerazîbûnên gelê herêmê û raya giştî ya navneteweyî bendav hat çêkirin û av lê hat girtin. Bi giştî 199 gund û navçeyên dirokî Heskîf a 12 hezar salî di bin avê de dimînin. Tê payîn ku dê 100 hezar mirov jî bendavê bi bandor bibin.

Bê gund îdare nake

Zeynep İder (68) a jî gundê Ewtê yê navçeya Misircê ya Sêrtê, yek jî wan kesan e ku gundên wan di bin avê de mane. Dayika Zeynep, dayika 5 zarokan e. Bi malbata xwe re heta sala 1994'an jî li vî gundî dijî. Piştî ku gundê Şemsê, Çêlika û Muwêlê ên li vî navçeyê, li ber çavên gundiyan tînin şewitandin, ew jî bi darê zorê jî gundê xwe derdikevin û tînin Êlihê.

Zarokên dayika Zeynep bi zor û zehmetî be jî hîna jiyana bajêr dibin, lê ew bêtî gundê xwe îdare nake. Ji bo vî yekê di sala 2003'yan de dayika Zeynep ku li bajêr tebatî nayê, bi tena serê xwe vedigere gundê xwe yê Ewtê. Bi giştî 60 salên dayika Zeynep li gundê Ewtê derbas bûne.

Lê di 2019'an de dayika Zeynep neçar dimîne ku gundê Ewtê yê gelek pê şêrîn careke din terk bike. Dayika Zeynep bi van gotinan qala roja xwe ya veqetandina jî gund kir: "Avê heta neda bû bin malê jî, min nedixwest jî gund derkevim. Roja beriya ku gund di bin avê de bimîne, min bîstanê (bostan) xwe av da. Her malbata ku jî gund derdiket mala xwe xera dikir, lê qet destê min neçûyê ku ez mala xwe xera bikim. Ew mala diya min bû. Diya min dihat ber çavê min. Ka ez dikarim van jîbîr bikim. Gava em zarok bûn dihat gotin ku ew ê zemanekî were xelk miriyên xwe jî bin erdê derfîne. Vêca ew zeman ev zeman e. Ji ber ku miriyên me di bin avê de nemînin, me ew derxistin û birin gundê Ewta Jor."

Xewn û xeyalên wê yê gund

Dayika Zeynep, diyar ku jî ber salên xwe yê dîr û dirêj ên li gund, qet jî jiyana bajêr hez nake. Dayika Zeynep bandora derketina jî gund a li ser xwe jî wiha anî ziman: "Niha gava ez diçim deverekê û bi tena serê xwe dimînim, kelogirî dibim û bêriya gundê xwe dikim. Piştî jî gund derketim û hatim Êlihê, demekê jî xwarin û vexwarinê bûm."

Dayika Zeynep herî dawî qala xew-nên xwe yê piştî veqetîna jî gundê xwe jî kir û ev tişt gotin: "Hingî ez mî-tala Ewtê dikim, hema bêje her şev tî xewna min. Beriya du rojan jî di xewna xwe de ez li Ewtê bûm. Di xewna xwe de ez û birayê xwe di nav bîstan de me tîriyê taîffî berhev dikir."



TIŞTÊN HÊJA BIAFIRÎNIN, DÊ KURD BIXWÎNIN Û QEDIR Û QÎMETA WE BIZANIBIN

Her derfetê bi kar binin

→ Zekî Gurur

Zimanên nefermî hatine lawazkirin û gelek jê ketine rewşeke kembax û heta ber sekeratê jî. Tirsana nemana temamî ya li ser hewramî û zazakî ciddî ye. Kurdî û heta belûcî jî bi hejmara axiverên xwe ji gelek zimanên resmî yên gelek dewletan mezintir in

HUSEIN MUHAMMED kî ye?



Husein Muhammed sala 1980'yî li Zaxoyê hatiye dinyayê, di navbera salên 1988-93'an de li Bakur jiyaye û ji sala 1994'an ve li Finlandayê dijî. Wî li zanîngehê hiqûc, wergerandina îngilîzî û zimannasiya giştî xwendiyê. Niha li Enstîtuya Zimanan a Finlandayê dixebite.

Mêvanê Xwebûnê yê vê hejmarê zimannasê kurd Husein Muhammed e. Me ji bo xwendevanên xwe yê hêja ev hevpeyvîn der barê pirsên zimanê kurdî de amade kir. Fermo em bi hev re li bersivên rêzdar Muhammed binihêrin.

Tu wek zimannasê, ji bo 21'ê Sibata Roja Zimanê Dayikê ya Cihanê çi difikirî? Ev roj di halê heyî de li gel paşxaneyê xwe ya tarîxî di meseleya aktûela zimanî de tê çî maneyê?

Cejn û rojên taybet helbet giring in. Tiştêkî ne bêtawê ye ku rojek bo zimanê dayikê jî hatiye diyarkirin. Divê em rojên wiha bo geşkirina mijarê wek derfet bi kar binin. Lê tiştê giring ew e ku em tenê di çarçoveya van rojan de nemînin. Kurdî yan ti zimanekî din nikare bijî eger em tenê wan di rojên wiha de bi bîr binin û wek din li mala xwe bédeng rûnin. Divê em seranserî salê bo zimanê xwe bixebitin û di rojêke wiha de encamên wê xebata xwe ya tevahiya salê pîroz bikin, ne vê rojê tenê wek slogan bi kar binin.

Ziman îro ji bo serdest û bindestan li gorî kîjan refleks û reftaran ji hevdu cuda dibe? Bo nimûne Roja Zimanê Dayikê ya Cihanê ji bo erebek, farisek, tirkê an îngilîzê û rûsek belkî çî girîngiya xwe tune, lê ji bo kurdan belûcek ev yek cuda ye.

Zimanê ku tevahiya dewletekê pê bixebite, wek tirkî, yan jî heta bi dehan dewletan pê bişuxilin, wek îngilîzî, bêguman ti gef û metirsiyên cidî li ser nemana wan zimanan di asoyê de nîne. Loma tirkê an îngilîzê ne hewce ye ji nemana pareke xwe anku ji nemana zimanê xwe bitirse. Madem ku tirseke wiha ji wan re tine ye, mijara pîrozkirina salane jî ji wan re ne giring e.

Rojêke wiha zêdetir bo wan zimanan giring e ku hewcedarî baldarî û xemjêxwarinê ne. Kurdî û heta belûcî jî bi hejmara axiverên xwe ji gelek zimanên resmî yên gelek dewletan mezintir in jî (bo nimûne ji zimanên bakurê Ewropayê) lê ew di meydana giştî de lawaz in ji ber ku dewlet bi wan nayên birêvebirin (eger em başûrê Kurdistanê wek dewleteke de facto nehesibînin.).

Anku girîngiya rojêke wiha bo qisekerên zimanekî ji pêwistiya parastin û pûtekirina bi zimanê wan tê.

Ji ber ku ciwanên bengalî doza mafê zimanê xwe dikirin ji aliyê polisên bangladeşî ve hatin kuştin û ev roj ji aliyê UNESCO'yê ve wek Roja Zimanê Dayikê ya Cihanê hat îlankirin. Lê çend meh berê li Rûsyayê kalekî 79 salî Albert Razîn ê Ûdmûrtiyê got; "Eger zimanê min wê sibe bimire, wê demê ji bo mirinê îro ez amade me" û xwe şewitand û kuşt. Dema mirov herdu bûyeran di de berhev gelo ji wê demê heta niha çî guheriyê?

Berê gelek ziman hatine serkutkirin anku bi darê zorê û şidetê rê li wan hatiye girtin. Li dinyayê gelek nimûne hene lê bawer nakim ku ti zimanekî din bi qasî ku, bi taybetî li Bakur, wiha ketibe ber zimankujiyê (linguicide).

Van salên dawiyê hem li Kurdistanê û hem jî li welatên din êdî jî rêgirtina yekcarî û şidetî zêdetir bi rêya paşguhkirin û tinehesibandinê muamele li gel zimanên nefermî hatiye



kirin. Eger bi temamî neqediya jî, êdî qedexekirin û şîreta demên borî dijî zimanên nefermî bi awayekî vekirî û bi qanûnan kêmtir bûye. Lê ji ber kiryarên raboriyê, zimanên nefermî hatine lawazkirin û gelek jê ketine rewşeke kembax û heta ber sekeratê jî.

Bo ku tezmînata neheqiyê raboriyê bi awayekî rewşa û adilane were dayîn, divê bo zimanên wek kurdî ji aliyê dewletê ve bernamêyên taybet yên pêşvebirin û geşkirinê werin danîn da ku zimanê lawazkirî bikare bi ser xwe ve were û dîsa bihêz bibe.

Hin kes ji bo kurdî û nemaze hin zaravayên kurdî pênasîyeke wiha dikin û dibêjin "kurdî ber bi tunebûnê ve diçe". Di vê çarçoveyê de tu rewşa kurdî di nav zimanên cihanê de çawa dibîni? Ev rastîyek e yan îluziyonek e? Tu dikarî nîrxandîneke giştî bo kurdî bikî?

Mirov nikare bo kurdî bi tevayî tenê bersivêkê bide. Rewşa soranî û heta ya kurmançî jî bi temamî ji ya hewramî û zazakî cuda ye. Hewramî jî ber hejmara kêman kêmbûyî ya axiverên xwe bi rastî jî li ber nemanê ye. Mana wê heta sedsala 22'an dê mucîzeyê mezîn be. Hejmara qisekerên zazakî ne kêman e lê pêlêke zimanvegustastinê (language change) ji zazakî bo tirkî di nav peyiverên zazakî de mixabin xurt e. Tek rêgirtina li ber windabûna temamî ya zazakî ew e ku di demeke ne dûr de perwerdeya bingehîn ya axiverên zazakî jî tirkî bibe zazakî yan jî zazakî û tirkî.

Herçî kurmançî û soranî ne, bo wan nemanekî temamî di asoyê de nabînim.

Li aliyekî, hem kurmançî û hem jî bi taybetî soranî li başûrê Kurdistanê zimanê rojane yê danûstandinê bi her awayî yên xelkê ne û herdu zarava di her warê jiyanê de tînan bikaranîn (kurmançî li parêzgeha Dihokê û Soranî li parêzgehên Hewlêrê û Silêmaniyê). Herwiha li rojavayê Kurdistanê jî kurmançî jî xwe re hinek derfetên baş afirandine tevî ku siberoya Rojava hê şêlû ye.

Li aliyekî din, mixabin mimkin e ku hejmara qisekerên herdu kurmançî jî û soranî jî di demeke nêzik

de ji niha gelek kêmtir bibe.

Rewşa zimanvegustastinê ji kurmançî bo tirkî di nav hejmareke mezîn ya kurdan de li bakurê Kurdistanê baş tê zanîn. Ji ber ku kurdî û tirkî du zimanên bi temamî ji hev cuda ne, zimanvegustastina ji kurdî bo tirkî, gava ku dibe, zelal e. Lê kêmtir behsa wê yekê hatiye kirin ku li rojhilatê Kurdistanê jî hem kurmançî û hem jî soranî mixabin di proseya hêdî ya zimanvegustastina ji kurdî bo farişî de ne. Ji ber ku kurdî û farişî zimanên lêzim in, ev prose ne wek ya ji kurdî bo tirkî zelal e lê mixabin her heye. Roj bi roj bêje û biwêjên kurdî di axiftina xelkê de cih didin yên farişî û wiha hêdî-hêdî kurdiya wan vediguhêre farişî.

Li Başûr û Rojava jî li deverên ku ne di bin kontrola kurdan de, bo nimûne li Efrînê, Kerkûkê û Xaneqînê tirsana guherandina demografîyê heye û pê re jî nemana zimanê kurdî li wan deveran.

Eger kurt bikim: Tirsana temamî ya li ser hewramî û zazakî ciddî ye. Tirsana li ser kurmançî û soranî ew e ku bergehê wan teng bibe û ji gelek deverên kurdînişin winda yan lawaz bibin.

Îro ji ber gelek sedeman, profîlên zimanî yên curbicur ji bo zimanê kurdî derketine meydana. Kurd bi giştî êdî cotziman/pirziman in û ev rewş bandoreke çawa li ser rewşa zimanê kurdî dike?

Li dinyaya niha duzimanîtiyê yan pirzimanîtiyê ne tiştêkî ecêb e lê gelekî normal e. Ji niha pêve yekzimanîtiyê hêdî-hêdî dibe tiştêkî nadir. Ya giring ew e ku derfet û delîve hebin ku her kurdek bibe xwedî bingehê xurt yê kurdîzanîne. Ev jî tenê û tenê bi rêya perwerdeya bi zimanê kurdî mimkin e. Lê heta ku em bigihin rojêke wisa, divê ku hemû derfetên heyî bo xwehînkirina kurdî hem bi nivîskî û hem jî bi axiftinê bînin bikaranîn.

Wek ziman jî, helbet tesîra wê yekê li kurdî dibe. Bo nimûne gelek fraz yekser ji zimanekî din li kurdî tînan wergerandin. Eger frazeke li cihê wê di kurdî de tine be, wergerandina frazên jî ne xirab e. Vê dawiyê piraniya zi-

manên mezin jî frazên nû ji inglîzî werdigerînin zimanê xwe û bi kar tînin. Lê eger li cihê wê di kurdî de yek an hinek fraz hebin, divê yên heyî bînin tercîhkirin. Loma em hewceyî ferhengên baş yên frazeolojîyê ne.

Di rewşa kurdî de divê mirov di wergerandina frazên de hişyar û baldar be. Çunkî eger mirov bo nimûne frazekê ji tirkî wergerîne, dibe ku ew fraz di erebî û farişî de ne wisa be û bikaranîna wê fraza wergerandî ji kurdî ne-bakurî re dikare tiştêkî nefehmbar be. Wek mînak, bakuriyan "aramak" ya bi wateya "telefon kirin"ê yekser wek "lê gerîn" wergerandiye kurdî. Lê li Başûr, Rojhilat û Rojava mirov "lê gerîn"ê bi wateya "telefon kirin"ê fehm nake. Tiştên wiha hevfehmkirina kurdî jî parçeyên cuda diwartir dike.

Kurdî li gorî 100 sal berê zêdetir tê xwendin/nivîsin lê kêmtir tê axaftin. Ev yek li dor çarçoveya asimilasyonê, tesîreke çawa li kurdî dike?

Berê bo jîndariya zimanekî tenê axaftin jî bes bû. Niha nivîsin û xwendin jî beşeke zerûrî ya zindîtiya her zimanî ye. Lê ti ziman demeke dirêj tenê bi xwendin û nivîsinê nikare bijî. Loma divê em bi kurdî bi axivîn, bixwîn û binivîsin jî.

Ji bo parastin, pêşvebirin û geşkirina zimanê kurdî şîret, pêşniyaz û tesbîtên te çî ne gelo?

Di raboriyê de neheqiyên mezîn li vî zarê zêrîn bûne. Lê nabe ku em wê ji xwe re bikin hêcet û bihêlin ku kurdî lawaz bibe. Belkî derfetên dewletan di destê me de nînin lê di dinyaya îroyîn de gelek derfet bi destê şexsên xîretdar û komên dilxwaz jî tînan afirandin. Divê em herdem hem mafên xwe yên rewşa bixwazin û hem jî heta wergirtina wan mafan her derfeta heyî bi kar binin.

Gelek caran nivîskar û zimannasên kurdî giilî û gazinan dikin û dibêjin ku kurd berhemên wan naxwînin û giringiyê nadin wan. Lê ez dixwazim berê meselê bizivîrînim û ji nivîskar û zimannasên me re bibêjim: Tiştên hêja biafirînin, kurdê bixwînin û dê qedir û qîmeta we jî bizanin!

Ji bo plansaziya ziman pêwîstî bi xebatên qadê yên zimannasiya civakî heye. Di vî warî da hê jî xebatên ku karibin ji bo pêkanîna nexşerêyeka zelal daneyên pêwîst bidin, nehatine kirin. Lê belê berî çend rojan Navenda Lêkolînên Civakî, Politîk ên Qadê encamên rapirsîneke xwe bi raya giştî ra parve kir.

Di vî rapirsîna giştî da her çiqas ji bo plansaziyeke zimanî û nexşerêyeka zelal tîra xwe dane tunebin jî, agahiyên hêja û balkêş hene. Li gorî agahiyan ev rapirsîn di navbera 7 û 12ê meha yekem da li 16 bajar (Amed, Riha, Şirnex, Êlih, Semsûr, Dêrsim, Qers, Îdir, Bedlîs, Mûş, Çewlik, Agirî, Colemêrg, Sêrt, Mêrdîn û Wan) û 49 navçeyan wan bi 5600 kesî ra rû bi rû hatîye kirin. Encamên ku ji rapirsîne derketine jî nişan didin ku zimanê wekî berfa li ber tavê roj bi roj dihele, axêverên zimanê me her ku diçe kêmîtir dibin.

Encamên rapirsîne bîr û boçûnên gelek zimannas û zimanhezan diselmînin.

1 - Zimanê kurdî bi piranî di malê da, bi xizm û nasan ra tê xebardan.

2 - Kesên xwende li gorî kesên nexwende kêmîtir bi kurdî dipeyivin.

3 - Kesên kal ji navsereyan, navsere jî ji ciwanan zêdetir kurdî bi kar tînin.

4 - Kesên xizan ji yên dewle-



Ziman û Raman

Samî Tan

Rapirsîna bikaranîna zimanê dayikê

mend zêdetir bi kurdî dipeyivin.

Ev rapirsîn der barê rewşa civakî ya kurdan da jî agahiyên balkêş dide.

Li gorî rapirsîne;

1 - Hê jî rêjeyeke zêde ya civaka kurd nexwende ye (%26,9).


2 - Nivê civakê betal û karkerên navmalî ne (%43,9+%10,9).

3 - Ji nivê civakê zêdetir, xwediyê dahatiyeke di bin sinorê birçibûnê ra ne (%25,7+%27,8).

4 - Piraniya kurdan li bajaran bijîn jî, hê jî nivê zêdetir ji kurdan li gundan hatine ser rûyê cihanê (%52,4).

5 - Li van bajaran hê jî piranî (%78,7) xwe wekî kurd dibînin.

Ev rapirsîn der barê rewşa zimanê kurdî da hemû daneyên pêwîst nade, lê belê hinek daneyên girîng di nava xwe da dihevine. Bo nimûne li gorî encamên rapirsîne hê jî ji sedî 65,8 bi kurmancî û ji sedî 3,6 jî bi kirmanckî, anku ji sedî 69,4 di mala xwe da bi kurdî dipeyivin. Rêjeya mîrên ku bi kurdî



dipeyivin (kurmancî % 65,6+ kirmanckî %4) ji ya jinan (kurmancî %66+ kirmanckî %3,2) zêdetir e. Rêjeya axêverên kurdî her ku nişkek

ciwan dibe kêmîtir dibe (ciwan (18-24) : %64,5+ %3,70; kal û pîr (65+): %68+%2,60). Di vî mijarê da rewşa kirmanckî balkêş e.

Axavêrên ciwan ji yên kal û pîr zêdetir bi kirmanckî dipeyivin.

Kesên xwende (Zaningeh %54,6+ %6,5) ji kesên nexwende (%73,3+ %2,7) kêmîtir bi kurdî dipeyivin. Li vî derê jî rewşa kirmanckî berevajî ye, lewra xwende (%6,5) ji nexwendeyan (%2,7) zêdetir bi kirmanckî dipeyivin.

Kesên xizan (%76,7+ %1,60) ji kesên dewlemend (%46,5+ %7,80) zêdetir bi kurdî dipeyivin. Di vî warî da jî kirmanckî ji kurmancî cuda dibe; ji sedî 7,8ê kesên ku dahatiya wan di ser 5 hezarî ra bi kirmanckî dipeyivin, lê belê ji sedî 1,6ê kesên herî xizan (0-1000 TL) bi kirmanckî dipeyivin. Rêjeya axêverên kurdî li kuçe û kolanên li gorî malê kêmîtir dibe û dadîkeve rêjeya %59,4an.

Rewşa herî kambax li saziyên fermî derdikeve pêşberî mirov, li van saziyan rêjeya axaftina bi kurdî dadîkeve ji sedî 11,8an. Ev yek sedema rewşa kambax a kurdî jî bi awayekî zelal nişan dide; pêşî di kar û barên fermî da kurdî hatîye berbandkirin, piştê jî kurdî ji gelek qadên jiyane hatîye vederkirin. Niha bi tenê mirov li malan û hinekî jî li kuçe û kolanên bi xizm û nasan ra bi kurdî dipeyivin, lê jî ber ku gelek malbat kurdî hinî nişên nû nakin, rêjeya axêver kurdî roj bi roj kêmîtir dibe.

21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî ye. Lê belê ne ya hemû zimanan. Tenê gelên zimanbindest an jî hinek ji wan vî rojê pîroz dikin. Xweyîderketina li zimanekî dibe kul û dert, tenê wexta ew ziman di bin xeteriya windabûnê de be, an jî qedexe be. Lewma hûn ê ti caran nebînin ku gelên serdest yên wekî tirk, ereb, faris, alman, amerîkî an jî îspanî vî rojê pîroz bikin. Ji ber ku zimanê wan nehatiye qedexekirin, ti kesê jî van gelên serdest ji bo zimanê xwe nehatiye kuştin. Li ser zimanên wan tehde nehatiye kirin. Lê belê gelên wekî kurd, baskî, katalanî, berberî, galî, ermen, asûrî, talîş, orî, frîzî, galîsyan, samî û bi hezarên din sedsala dawîn de eş û êrişên giran ditîne. Jixwe gelê ev roj diyarî hemû zimanan kiriye bengalî ne, ku bi berxwedana xwe ya zimanî bi nav û deng bûne li hemû cihanê.

Kurteyîroka vî rojê ev e: Piştî welatê Pakîstanê sala 1947'an de ji Hindîstanê veqetiyaye û serxwebûna xwe îlan kiriye, zimanê urdû wek tenê zimanê Pakîstanê hatîye daxuyandî, hemû zimanên din ên wê erdnigariya pîrziman hatine qedexekirin. Yek ji van zimanan bengalî bû. Gelê bengalî hem serdestiya dewleta nû hem jî yekzimanîbûna wê qebûl nekir û derket kolanên ji bo ku li axa xwe û zimanê xwe xweyî derkeve. Di 1952'an de, di xwepêşandaneke de, polîsên pakîstanî gule reşandine ser van ciwanan û di encamê de hinek ciwan şehîd bûne. Piştî vî bûyerê têkoşîna gelê bengalî zêdetir bûye. Di encamê de gelê bengalî di 1971'î de serxwebûn û azadiya xwe bidest xistiye û ev roj kiriye Roja Şehîdên Zimanê Dayikê. 21'ê sibatê jî wê rojê heta niha wek Roja Şehîdên Zimanê Dayikê tê pîrozkirin, keda şehîdên



Şerîf Derînce

Berxwedan ziman e!

bengalî tê bibîranîn. Di 1999'an de, UNESCO'yê ev roj wek Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî qebûl kiriye û her sal di vî rojê de çalakiyên cur bi cur jî bo hişyariya ziman pêk tîne.

Kurd jî bi qasî deh panzdeh sal in vî rojê pîroz dikin bi beşdarî û rêxistana saziyên peywendîdar, wek Kongreya Civaka Demokratîk, Şaredariyên me, Kurdî-Der, Egitim-Sen û hinek saziyên din. Mebesta çalakiyên vî rojê dualî ne. Ji aliyekî ve ji dewleta tirk re tê gotin ku kurdî wek zimanekî fermî bê qebûlkirin û di kar û barên fermî de were bikaranîn. Ji aliyê din jî bangewazî tê kirin ji bo gelê kurd ku li zimanê xwe xweyî derkeve, di danûstandinên xwe yên civakî û aborî de kurdî bi kar bîne û zimanê xwe bigihîne nişên nû. Mebestên bi vî rengî di daxuyaniyên piraniya gelan û taybetî ya UNESCO'yê de cih digirin.

Helbet, ev çend sal in taybetiyeke din a vî rojê heye ku rast li wateya esasî ya 21'ê sibatê tê. Ew jî xwedîderketina berxwedana li Bakur û Rojava ye. Bajarekên ku heta niha jî bo azadiya Kurdistanê li ber xwe dan û xweparastineke xurt kirine û îro jî dikin di heman demê de kelehen zimanê kurdî ne jî. Her ciwanên ku şehîd dikevin di heman demê de şehîdê kurdî ne jî. Her kesê/a parastina gelê xwe dike, di heman demê de parastina kurdî jî dike.

Dîroka zimanan nişan dide ku mixabin heta berxwedanek xurt pêk nehatiye tu ziman azad nebûne, nekarîne bibin xweyî

hêz û statuyek. Em jî minakên bengalî, galî û baskî baş dizanin ku azadiya ziman bi statuya siyasî û civakî re girêdayî ye. Bê statu, dek û dolabên dewletan, desthilatdarên serdest her didome. Di deha salên dawî de gelek aşkera hat ditin ku li Bakur dewleta tirk di warê ziman de hinek gavan bavêje jî, van gavan jî bo serdestiya xwe bi kar tîne û dixwaze bi vî yekê berxwedana gel pûç bike. Ji aliyekî ve weşana kurdî dike, lê weşanên kurdî rêxistinbûyî qedexe dike. Zimanê kurdî wek darsa hîlbiartî dide, lê belê nahêle dibistanên azad bi kurdî perwerdeyê bide. Hemû komele, sazî û dezgehên kurdan girtin, dest danîn ser şaredariyên kurdan ku xizmetek gelek girîng dikirin ji bo kurdî. Hê jî zimanê kurdî piçûk dixê û agirê nijadperestîya di nav civaka serdest de gur û har dike ku di encamê de karkerên kurd ên li bajarên rojavayê Tirkiyeyê dixebitin rastî êrişên faşîstan tîne, tenê jî ber ku bi zimanê xwe diaxivin.

Wekî serboriya gelên din jî nişan daye, bê statuya fermî qedexe û zordariyên li ser zimanan her tim didome. Lewma jî berxwedan û parastina îro tê pêşxistin tenê rêyek dimîne ji bo azadiya gel û azadiya ziman. Dîsa dîroka ziman nişan daye ku, wekî gelê bengalî, hemû gelên berxwedêr û tekoşer rojek digihin armanca xwe û azadiya xwe pêk tînin. Em hêvî dikin heta 21'ê sibateke din, zimanê me li ser axa Bakur hatibe azadkirin, bibe nimûneya sêyemîn piştî serboriya Başûr û Rojava.



Hunermend dê bibin dengê gelê xwe

Hunermendên kurd li bajarên Silêmanî û Hewlêrê du civîn li dar xistin. Di encama nîqaşan de ji bo xebatên yekitiya neteweyî ya kurd Platforma Hunermendan hat avakirin

Navenda Nûçeyan

Êrişên li hemberî çar parçeyên Kurdistanê pêwîstiya yekitiya neteweyî bêhtir derdixe holê. Li rojava, başûr, bakur û rojhilatê Kurdistanê partî, sazî û rêxistinên kurdan nîqaşên xwe yê ji bo yekitiyê didominin. Li gel van hewldanan xebatên hunermendan jî girîng in. Hunermend dikarin bibin dengê hemû parçeyên Kurdistanê.

Huner li ser civakê, ji siyasê bandortir e. Di têkoşîna azadiya Kurdistanê de her tim rol û mîsyona hunermendan hebûye. Bi stran û klamên xwe daxwaza xwe ya bi sedsalan anîne ziman. Bi klam û stranên xwe bûne parêzvanên çand û zimanê kurdî.

Di her serdemê de sekn û helwesta hunermendan girîng e, ji ber ku hunermend bi berhemên xwe dikin ku civak her tim zindî bimîne. Hunermendên ku her tim bi stranên xwe bûn dengê gel, niha jî ji bo avakirina yekitiyê zend û bendên xwe badan. Xebatên hunermendan jî bo gel bû hêviyek.

Hunermendên kurd di avakirina yekitiya kurd de xwe berpis dibînin û dixwazin erka xwe pêk bînin. Di çarçoveya xebatên yekitiyê de hunermend jî ketin nav hewldanan. Ji Ewropayê heta Bakur û ji Başûr heta Rojava hunermend dikarin daxwazên xwe bikin yek û bibin dengê gelê xwe.

Platforma Hunermendan

Di vê çarçoveyê de hunermend li başûrê Kurdistanê dest bi xebatan kirin. Destpêkê li Silêmanî û Hewlêrê civîna hunermendan li dar xistin. Dê piştê jî li Dihokê bicivin. Di civîna Silêmanî de Platforma Hunermendan hat avakirin ku platform ji 20 kesan pêk tê û dê plan-



saziya kar û xebatên xwe pêşerojê saz bike. Ev platform dê bi hunermendên kurd ên li Ewropa û çar parçeyên Kurdistanê re di nav têkiliyan de be. Bi vê platformê tê armanckirin ku xebatên hunermendan bîn berfirehkirin.

Di çarçoveya xebatan de civîna duyemîn jî bi tevlibûna hunermend Xelîl Xemgîn, Şivan Perwer, Nasdar Cizirî û Diyar Dêrsim li Hewlêrê hat lidarxistin. Di civînê de rola hunermendan a ji bo yekitiya neteweyî guftûgo kirin.

Derbarê xebatên yekitiyê de hunermend Diyar Dêrsim axivî. Dêrsim di axaftina xwe de bal kişand ser pêwîstiya yekitiyê û wiha got: 'Di xewna her kurdekî/ê de yekitiya neteweyî heye. Kurdistan di dilê me de yek parçe ye. Lê mixabin me hîn xewna xwe pêk neaniye. Lewma me dest bi hewldaneke wisa kir.'

Hunermend Xelîl Xemgîn jî di axaftina xwe de destnîşan kir ku siyasêmedaran ji bo yekitiyê erka xwe pêk neaniye. Xemgîn, behsa rola hunermendan a di nav civakê de jî kir û wiha dom kir: 'Divê em hunermend li ser wijdanê civakê zextê bikin ku aliyên siyasî bikaribin yekitiyê û yekrêziyê biafirînin. Divê em hunermend wisa bikin ku di nav kurdan de yekitiyê û yekrêzî bibe avakirin.' Xemgîn, diyar kir ku heke hunermend jî erka xwe bi cih bînin wê yekitiyê pêk bê û ew dixwazin ku helwesta hunermendên başûrê Kurdistanê jî di mijara yekitiyê de hebe.

Di yekitiyê de dengê jinê...

Hunermend Niyar Ebdullah a ji başûrê Kurdistanê ye xebatên ku tên kirin nixand û li ser girîngiya yekitiya hunermendên jin sekinî. Ebdullah wiha dirêjî da axaftina

xwe: 'Gelek girîng e ku dengê hunermendên jin di hewldana yekitiyê de bilind bibe. Jinên hunermend dikarin bi hunera xwe xizmetê bidin doza neteweyî.'

Lukman Selîm wekî hunermendê din li ser hewcedariya yekitiyê nêrînen xwe anîn ziman û diyar kir ku divê partî di xizmeta gelê xwe de bin, ne ku netewe di xizmeta partiyên de be. Selîm, da zanîn ku lewma divê hunermend jî nakokiyên partî û rêxistinên dîr bikevin.

Hikûmet bê helwest e

Rojnameger û hunermend Îbrahîm Ehmed jî li ser helwesta hikûmeta herêmê nêrînen xwe anîn ziman û wiha axivî: 'Divê tiştê ku em niha dikin di bernameya hikûmeta herêmê de hebûya. Lê mixabin di mijara neteweyî de tiştê ku di bernameya wê de nîne.'

Li dijî kurdan oryantîzma û apartheîda dîplomatîk

Ferat Amed

Hindistan di sala 1980'an bernameya xwe ya nukleerî aşkera kir û di sala 1997'an de jî çekên xwe yê nukleerî ceribandin. Ragi-handina bernameya nukleerî û çekirina çekên nukleerî yê Hindistanê, ji aliyê dewletên ku berê xwedî nukleerê bûn bi neyînî û hêrs hat pêşwazîkirin. Perspektîfa welatên mezîn, li ser welatên rojhilatî bi pêşdaraz û oryantîst bû.

Welatên mezîn wê demê hebûna çekên nukleerî yê li Çîn û Rûsyayê qebûl dikirin. Ew nişan dida ku mentalîteya welatên mezîn li ser 'paşverûtiya' Hindistanê, ne li ser bîngeha cografî, lê li ser hiyerarşîya çandî ye. Antropolog Hugh Gusterson ew ramana welatên mezîn a ji bo Hindistanê wekî 'Oryantîzma Nukleer' bi nav dîke. Li gor nirxandina rojavaya spî, ew bi xwe mirovên bi disiplin û aqilmend in, lê mirovên rojhilatî serserî û hestiyar in. Lewra pêşxistina

çekên nukleerî yê dikarin dawiya dinyayê bînin ne heqê rojhilatîyan lê tenê heqê rojavayîyan e. Rêveberên Hindistanê jî ew pergala wekî apartheida nukleerî bi nav kirin.

Gelê kurd bi nifûsa xwe yek ji gelên herî mezîn ê bêdewlet e. Kurdistan bi nasname, şaristanî û girîngiya xwe ya jeopolîtîk li Rojhilata Navîn bêhempe ye. Ligel projeya DYAYê ya kemera kesk û provakasyonên dewletên desthilatdar li ser cografyaya Kurdistanê, îslamiyeta radîkal û cihadî bi pêş neketiye. Tu partî û tevgerên Kurdistanê welatên rojava wekî dijmin nabînin. Dilsoziya xwe ji bo nixê rojava wekî mafên mirovan û demokrasî nişan didin. Tevî welatên rojava dijminên kurdan e, ji bo berjewendiyên xwe xwedî dikin. Sekna tevger û gelê kurd jî li hemberî wan welatan hê jî dostane ye.

Diktatorê Iraqê Saddam Hu-

seyîn bi alikariya hezên peşmerge hat xistin û başûrê Kurdistanê bi her awayî alikariya welatên koalîsyonê kir. Iraq jî bo hezên amerîkî çiraveke bêbînî bû. Lê Başûr tevî kêmasiyên xwe mîna kek pêşkerî bû ji bo demokrasîyê. Kurd di pêvajoya nû de bi hev-bendiya DYAYê hevîdar bûn. Dema milîsên gîredayî Îranê berê xwe dan Kerkûkê çavê kurdan li Washingtonê bû. Lê belê derket holê ku DYAYê bi xwe yek ji organîzatorê dagirkeriyê ye. DYAYê bi alikariya hezên peşmerge li dijî DAISê bi ser ket. Êrişên çeteyên Îranê bi alikariya dewleta Iraqê jî bo tunekirina îxtimala serxwebûna kurd bû.

Tu hebûn û hevalbendên DYAYê li Sûriyeyê tunebûn. DYAYê pereyên mezîn da milîsên Tirkîyeyê, lê belê ew nekarî şer bikin û belav bûn. DYAYê li Sûriyeyê bi tifaqa hezên YPG'ê gîhaşt baregehên bi ewle û mayînde. YPG û HSD bi serfirazî û fedaitiyeke mezîn DAISê tîk bir. Hemû pîspor serfiraziya leşkerî û siyasî ya YPG û HSD'ê jî gelek dewletên Rojhilata Navîn mezin-tir dibînin. Lê hezên navneteweyî

rê neda ku rêveberiya rojavayê Kurdistanê bi awayekî fermî bê nasîn. Dema Tirkîyeyê êrişî kurdan kir, DYAYê Rûsya bûn yek û ji bo serfiraziya hewldanên dagirkeriyê bi pêş bikeve xebitîn. Rojava jî bo cihanê li dijî DAISê şer kir.

Îro zengilên şer jî bo Îranê tên lîxistin. Çavên dewletên rojavayî li ser leşker û partiyên kurdan e ku ji bo alikariya wan bê kirin. Pergala ku Îsmail Beşîkçî wekî 'Pergala navneteweyî ya li dijî kurdan' bi nav kiribû, îro wekî apartheid û oryantîzma dîplomatîk didome. Ji bilî hevalbendên mayînde, tu kêmasiya kurdan ji dewletên axa Kurdistanê dagir dikin nîne. Oryantîzma li dijî kurdan bi dewletên navneteweyî pesnê heza leşkerî û bêtirsîya kurdan dide. Lê rê nade kurd bi awayekî navneteweyî bîn naskirin û statuya xwe ava bikin. Kurdên bêyî statuya fermî ligel hemû destkeftiyên defacto, dibin qurbanîyên êrişên hovane yê dagirkeran. Divê diplomasîya kurd ew helwesta durû teşhîr bike û ji bo destkeftiyên hiqûqî tevbigere.

Xweşkanî



Felemez Ulug

Tirkîye li Idlibê li ber tîkûnê ye

Rewş li Idlibê her diçe xirabtir dibe. Dewleta tirk ji bo xwe û hevalbendên xwe jî vî rewşa kambax derxe, di nav hewldanên pir kirêt û her wiha pir xeter de ye.

Rûsya beriya dest bi êrişan bike, ji ravedarên tirk xwest ku peymanên Astana û Soçiyê pêk bînin. Li Soçiyê Rûsyayê di payîza 2018'an de civînek pêk hatibû. Di civînê de biryara derxistina komên çete yê girêdayî dewleta tirk hatibû dayîn. Lê ev biryar di warê pratîkî de qet neket meriyetê. Lewma hezên rejîmê bi piştgiriya Rûsyayê di çarçoveya peymanê ku hatî îmzekirin de li Idlibê dest bi êrişan kirin.

Bêguman ev şerê li herêmê her diçe dijwartir dibe û di rojava Rûsyayê de ye. Bi pêşketina şer re li Rûsyayê li hemberî Tirkîye û Erdogan aciziyek pir mezin çêbû. Lewma atmosfera siyasî ya li Rûsyayê dişibe ya 2015'an. Em ji bir nekin ku di 24'ê mijdara 2015'an de dema balafira şer a Rûsyayê jî hêla Tirkîyeyê ve hat xistin, di navbera her du welatan de krîzek mezin rû dabû. Heta roja me ya îro jî dewleta tirk bandora wê krîzê dijî. Niha li Moskovê heman atmosfer heye.

Ev jî nişan dide ku Kremîlîn dê paş ve gav neavêje. Tirkîye jî biryarbûna rûsan ferq kir û niha ketiye nav hewldanên nermkirina rewşê. Ji bo vî mijarê binirxînin beriya çend rojan Erdogan bi rêya telefonê bi Pûtîn re axivî. Li gorî daxuyaniyên Kiremlînê neqîştine encameke erênî. Lewma piştî axaftina Erdogan û Pûtîn artêşa tirk ji bo herêma Idlibê dest bi sewqiyata çekên giran kir. Bi vî sewqiyat û daxuyaniyên Erdogan Tirkîye dikeve nav şer. Di vir de pîrsa girîng ev e: Tirkîye çima dixwaze tîkêve nav şerê ku dê wînda bike? Dewleta tirk tengav bûye û di warê leşkerî de jî bê awantaj e. Ger leşkerên tirk êrişî leşkerên rejîmê angoyê leşkerên rûs bike, gelo dê bikaribe herêma xwe biparêze. Ji ber ku qada he-wayî jî hêla Rûsyayê ve tê kontrolkirin, artêşa tirk nikare balafirên şer rabike. Gelek baregehên artêşa tirk ên çavderiyê di bin kontrola hezên rejîmê û Rûsyayê de ne. Li gor texmîna min hejmara leşkerên li van baregehên ne hejmara kême e. Her wiha Rûsya dikare di warê siyasî, leşkerî û aborî de Tirkîyeyê tengav bike. Ger mirov krîza aborî ya li Tirkîyeyê mîze bike ev şer bi her awayî jî bo Tirkîyeyê mirin e.

Wê demê ev şer xizmeta çî dike? Ev şer şerê desthilata Erdogan e. Erdogan jî bo xwe li ser piyan bigire û hebûna xwe berdewam bike pêwîstî bi şerê dibîne. Wisa diyar e ku êrişên li ser Rojava û Bakurê Sûriyeyê li gorî daxwazan bi encam nebû. Lewma serî li rê û rêbazên wiha xeter û çîrêz dide.

Îro gelê Tirkîyeyê bi her awayî eşa siyaseta şaş a desthilata AKP û MHP'ê dikeşîne. Ger pêşîya vî şerî neyê girtin dê zirara herî mezîn di şerê dibibe. Polîtîkayên şaş û hevalbendiya komên terorîst bi xwe re serkeftinê nayne. Ji ber hemû cihan dizane li herêma Idlibê dewleta tirk bi kê re û çawa tevbigere lê kes dengê xwe jî nake. Ger hin hêz bi dengê nîz li hemberî êrişên Rûsyayê derdikevin jî ev hemû siyasî ne û zêde ne girîng in. Bi kurtasî şerê li herêmê diqewime tu carî nebû şerê Tirkîyeyê. Pêwîst nîn bû ku artêşa tirk mîna hêzeke dagirker li ser axa welatekî din xwinê birijîne. Lê dagirkerî di xwina wan hezên serdest de heye. Dewleta tirk jî yek ji wan e. Lewma li herêmê dewleta tirk dibe qurbana hestên xwe yê dagirkeriyê.

Biryara Dadgeha Hewlêrê bû sedema bertekan

HEWLÊR - Di 17'ê tîrmeha 2019'an li restoranta Hoqqabaz a li bajarê Hewlêrê berpîrsê Teşkilata Îstixbarata Mîlî (MÎT) a Tirk Osman Kose hatibû kuştin. Piştî wê çend kes bi tometa destê wan di kuştina Osman Kose de heye hatibûn girtin. Di 10'ê sibata de Dadgeha Hewlêrê derbarê kesên ku hafî girtin de biryar da. Dadgeha Hewlêrê biryara bi darvekirinê li Mazlum Dag û Ebdurehman Er (Mehmed Di-jwar) birî. Biryara Dadgeha Hewlêrê di nava raya giştî de bû sedema bertekan. Bi taybetî jî xelkê Germiyane biryar şermezar kir û got li şûna ku sazîya MÎT'ê û endamên wê bihata dadgehkirin welatî tîndê dadgehkirin û cezayê kirin.

Ji bo avakirina platformê çûn serdana partiyan

SILÊMANÎ - Şandeyek ji jinên di nava Tevgera Azadî'yê de cih digire ji bo avakirina platformeke jinan a di nav partiyên siyasî de dest bi rêzehevdiştin kir. Şande dê hewl bide ku bi hemû partiyên siyasî yê li başûrê Kurdistanê re hevdiştinê pêk bîne. Şandeyê civîna xwe ya yekem bi jinên ku di nav Tevgera Goran de cih digirin re pêkanî. Şandeya ku li Baregeha sereke ya Tevgera Goran hat pêşwazîkirin, li wir civînek li dar xist. Çîgîra Hevseroka Tevgera Azadî'yê Bêrivan Mihemed, piştî civînê got platformek wisa pêwîste. Endama Pêwendiyên Siyasî ya Tevgera Goran Saze Ebdullah jî diyar kir ku hevî dikin êdî jin bibin yek.

Bi sedan jin beşdarê xwepêşandanan bûn

BEXDA - Xwepêşandanan li Iraqê bi mehane didomin. Di xwepêşandanan de bêtir jin derdikevin pêş. Di tevahiya bajarên Iraqê de jin daketin qadan û li dijî pergala hejî nêrazîbûnên xwe anin ziman. Bi taybetî li Bexdayê bi sedan xwendekarên jin û karkerên jin tevî xwepêşandanan bûn. Li bajarê Nasiriye'yê jî bi heman awayî gelek jin daketin qadan. Di xwepêşandanan de banga tevlihbûna jinan hat kirin. Jinên ku tevî xwepêşandanan bûn bertekên xwe li hemberî gendelî û namzetîya serokwezîrê Iraqê Mihemed Toftî Elawî nîşan dan. Tê payîn ku xwepêşandanan ku li gelek bajarên Iraqê pêk tîndê bi girseyeke mezin bidome.

NY'yê jî bo Lîbyayê agirbesta mayînde xwest

BRUKSEL - Mijara Lîbyayê hejî di rojevê de cih xwe yê germ digire. Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî jî bo şerê serê nîsana 2019'an li Lîbyayê dest pê kiribû, cara pêşîn biryara 'agirbesta mayînde' da. Pêşnumeya biryarê jî aliyê Kraliyeta Yekgirtî ve hat dayîn. Ji nav 15 welatên Konseya Ewlekariyê 14 welatan dengê erê dan, Rûsya bêalî ma. Ev pêşnumeya biryara xwestina îlankirina agirbestê sê hefte ne dihat nîqaşkirin. Hêzên navneteweyî di 19'ê çileyê de li Berlînê konferansek li dar xistibûn. Di konferansê de biryara 'yekitiyê' hatibû dayîn lê dîsa jî nêzikîyên dewletan bû sedema krîzan.

Gel li hemberî hilbijartinê bêhevî ye

Ambargoya Amerîkayê, zextên dîplomasiyê yê welatên Ewropayê û helwesta welatên Ereba li Îranê krîza siyasî mezin kir. Hilbijartinê li Îranê pêk tê jî tu carî jî bo gel nebû hevî

Navenda Nûçeyan

Zextên siyasî, aborî û leşkerî yê Amerîkayê li ser Îranê her ku diçe zêdetir dibin û Îran ber bi krîzeke kûr a aborî û siyasî ve diçe. Di roja 21'ê sibata de hilbijartinê 11'ê emîn a Parlamentoyê de li Îranê pêk were. Her wiha li gel wê hilbijartinê, hilbijartinê niv dewrî ya 5'ê emîn a dema Meclîsa Şarazayên Rêberî li 7 parêzgehên Îranê jî pêk hat. Li gorî daneyên ku pêşîya hilbijartinê hatin parvekirin jî sedî 80'yê welatîyan dê neçin ser sindoqan.

Parlamentoya Îranê jî 290 kursiyên pêk tê ku li 208 herêman hatine parvekirin. Li gorî daneyên dawî, li Îranê mafê 55 milyon kesane dengdanê heye. Her 190 hezar kes parlamenterekî/ê hildibijêrin. Li gorî qanûnên Îranê, Meclîsa Çavdêriya Destûra Bingîn a Îranê jî 12 endaman pêk tê û jî van 6 kes zanayên dîni ne ku rasterast jî aliyê Rêberê Olî'yê Îranê ve tîndê destnîşankirin. 6 kesên din ku hiqûqnas in, jî aliyê Serokê Sazîya Dadwer ve tîndê pêşniyarkirin. Bi dengê parlamentaran endamtiya wan tîndê erêkirin û piştî ku namzet serlêdanê dikin, serlêdana wan tîndê nirxandin.

Li gorî daneyên Wezaretê Hundirîn a Îranê parvekirine, heta niha nêzî 17 hezar kes jî bo hilbijartinê parlamentoyê bûne namzet. Lê serlêdana hejmareke zêde ya kesayetên siyasî yê Îranê jî aliyê Desteya Cêbicikar a Meclîsa Çavdêriya Îranê ve hatiye redkirin ku niha jî wan 90 kes parlamentaran in. Bi giştî namzetîya 9 hezar kesî hatiye redkirin. Lê hejmara dawî ya namzetan a jî bo parlamentoyê hîn nehatiye zelalkirin.

Ji ber bûyerên van demên dawî yê li Îranê; kuştina xwepêşandanan jî aliyê hêzên leşkerî ve, xistina balafîra Uqranyayê, bi taybet şewazê erêkirin û redkirina namzetan, çend parlamentaran niha û kesayetên siyasî yê naskirî, serî li namzetîyê nedan. Li gorî daneyên dawî, herî zêde li Parêzgeha Kirmaşan a Rojhilatê Kurdistanê û parêzgeha Elburz (Kerac) serlêdana namzetan hatiye redkirin. Di xwepêşandanan dawî de rola her du parêzgehan hebû.

Algirên xwe dikin namzet

Ji ber ku sîstema parlamentoya Îranê jî partiyan pêk nayê tu rola partiyan li parlamentoyê nîne. Ew partiyên ku li Îranê fermî tîndê qebûl kirin, yan di astekê



de mane, yan jî rê nadin ku çalakiyan bikin. Li gorî nav û listeya Wezaretê Navxweyî ya Îranê, kesên herî zêde jî bo namzetîyê hatine pejirandin muhafizekarên nêzî rêberê Îranê ne û rêjeyek kêma jî reformxwaz in.

Kurd boykot dikin

Ji ber ku tu partiyeke dijberî Îranê, nikare di nava Îranê de çalakiyan li dar bixe, gelek partî û rêxistinên muxalîf li derveyî Îranê çalakiyan li dar dixin. Li gorî daxuyaniyên dawî yê partî û rêxistinên Îranê ku di nava wan de partî û rêxistinên Kurdan jî hene

dê hilbijartinan red û boykot bikin. Her wiha partî û rêxistinên Îranê banga boykotê kiribûn.

Li Îranê alozî zêde bûn

Kanala fermî ya Îranê Turî Hewal bi navê 'Anketa Mezin a Nîştîman' anketek kir. Li gorî anketê jî sedî 80'yê xelkê Îranê tevî hilbijartinê nabe û hilbijartinê boykot dike. Li gorî ezmûn û encamên giştî yê hilbijartinên Îranê, heta niha di encama hilbijartinan de, li Îranê guhertineke demokratîk pêk nehatiye. Ji roja destpêkê ya desthilata Komara Îslamî ya Îranê heta niha, 12 caran

hilbijartinên serokkomartiyê, 10 caran hilbijartinên parlamentoyê, 5 caran hilbijartinên Meclîsa Şarazayan û 5 caran jî hilbijartinên Meclîsê bajaran pêk hatine. Her wiha 3 caran jî referandûm pêk hatiye. Lê heta niha tu hilbijartinê jî nikaribûye guhertinekê di nava Îranê de çêbibe.

Her ku diçe zextên siyasî, aborî û dîplomasiyê li ser Îranê zêde dibin. Ambargoya Amerîkayê ya 2 sal in didome, zextên dîplomasiyê yê welatên Ewropayê û helwesta welatên Ereba jî bûye sedem ku li Îranê alozî zêde bin.

HDP dê rêzika du serdeman bidomîne

Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) jî bo kongreya xwe ya giştî xebatên xwe bi dawî kirin. Li navçe û bajaran kongreyên xwe, li herêman konferansên xwe û herî dawiyê jî bi dirûşma "Hin bêtir HDP" a bi hêz û hin bêtir têkoşîna bi hêz" li Enqerê konferansa xwe ya navendî li dar xistin. Di çarçoveya xebatan de biryarên girîng hatin girtin û plansaziya pêşerojê hat derxistin.

Xebatên kongreyê ya ku di 23'yê sibata

de bê lidarxistin bi dawî bûn. Desteya Rêveberîya Navendê (MYK) ya HDP'ê beriya kongreya giştî civîna xwe ya dawî li dar xist. Her wiha demên borî jî bo amadekariyên kongreyê Komîs yona Mûtabakatê hatibû avakirin.

Li gorî agahiyên ji çavkaniyên HDP'ê hatin bidestxistin; prensîba rêzika du serdeman neyê guhertin. Tê payîn ku 20 rêveberên HDP'ê yê du serdeman xebitîne dê di komîsyonên partiyê de wezîfeyê bigirin.

Di HDP'ê de yê ku du serdemên xwe tije kirine navên wan wiha ne: "Berdevkê HDP'ê Gunay Kubîlay, Çîgirê Hevserokê Giştî Hişyar Ozsoy yê jî Têkiliyên Derve Berpîrsiyar, Çîgirê Hevserokê Giştî Azad Bariş ê jî Çapemeniyê û Propagandayê Berpîrsiyar."

Hat zanîn Komîsyona Mûtabakatê de navên endamên Meclîsa Partiyê û kadroyên rêveberiyê jî zelal bike. Serlêdanên tîndê kirin jî aliyê komîsyonê ve tîndê nirxandin. Her wiha hat zanîn ku di nîqaşên ku di komîsyonê de hatin kirin de jî bo hevserokatiyê bêtir navê Per-vîn Bûldan û Sezaî Temellî derdikeve pêş. ENQERE



Kongreyê pîrsgirêkên YNK'ê çareser nekir

2 meh li ser 4'ê emîn Kongreya Yekitiya Nîştîmanî Kurdistan (YNK) re derbaz bûn. Lê hejî jî pîrsgirêkên navxweyî yê YNK'ê nehatine çareser kirin. YNK'ê pergala hevserokatiyê erê kir, lê bi nerazîbûna hin rêveberan re rûbirû hat.

Di 21'ê qanuna 2019'an de li Silêmaniyê 4'ê emîn Kongreya YNK'ê hat lidarxistin. Kongreyê 4 rojan dom kir û endamên Desteya Bilind a Siyasî ku jî 8

kesane pêk tê hatin hilbijartin. Her wiha rêveberiya giştî ya ku jî 121 endaman pêk tê, hat hilbijartin.

Divê piştî 15 rojan kongreya Meclîsa Rêveberîya YNK'ê bicivîya û serok û sekreterên partiya xwe hilbijarta. Lê heta niha YNK'ê tenê pergala hevserokatiyê erê kiriyê. Pergala hevserokatiyê yekem car jî hêla Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve hatibû pêşniyarkirin. Li gorî Ocalan pergala temsîliyeta jin û mêran e. Lê li

gorî îddayan YNK'ê 2 mîr kirine hevserok. Lê hejî jî ev hilbijartin nehatiye zelalkirin û nayê zanîn wê kî bibin hevserok. Pergala hevserokatiyê, di nava YNK'ê de bû sedema nerazîbûnan. Li gorî agahiyên Berhem Salîh û Kosret Resul pergala hevserokatiyê qebûl nakin. Li gorî wan divê YNK xwedî serok an jî sekreterek be.

Endamê Meclîsa Rêveberîya YNK'ê Mistefa Çavreş diyar kir ku hejî jî tu kes jî bo hevserokatiyê

nehatiye diyarkirin, lê belê pergala hevserokatiyê hatiye pejirandin. Serokê Meclîsa Bilind a Siyasî ya YNK'ê Kosret Resul nameyek jî bo endamê Meclîsa Rêveber a YNK'ê Mistefa Çavreş şand. Resul di nameyê de nerazîbûna xwe anî ziman û daxwaza ragirtina civîna Meclîsa Rêveberîya Giştî ya YNK'ê kir. Ev jî nîşan dide ku kongreyê heta niha pîrsgirêkên navxweyî yê YNK'ê çareser nekirine. SILÊMANÎ

Ax! Welato

Ayhan Erkmen



Yemençayîr

Gundê Yemençayîrê ango Emançayîrê, girêdayî navçeya Dîgora Qersê ye. 35 kilometreyan dûrî Qersê û 20 kilometreyan jî, dûrî Dîgorê ye. Bi heft gundan re cîrantiyê dike. Ev gundana; Şîrînkoy, Şatîroxlî, Tirmaşîn, Zeynik, Zibînî, Yayla Sinco û Gulheyran in.

Nivîskarê nemir Heciyê Cindî, ji bo navê Emançayîrê, di biranînê xwe de dibêje ku 'Çayîr û çîmenên gundê me wisa xweş bûn, çavê kê ku pê diket, li hember wê bedewiyê metel diman û digotin 'eman çayîr!'

Erê gundekî biçûk e, lê ji aliyê xwezayî ve gelekî dewlemend e: Çayîr, merg û çîmen, wekî xalîçekê bi gul û rihanana xemilandî, li çar hêla gund wergirtiye. Kulîlkên cur bi cur; sorsorik, beybûn, piltan, kirkolk, xaşxaşk rengê xwe didin vê bedewiyê. Giha û pincarên wek pêqazk, ke-reng, siping, cetîrî, tîrşo, mendik tema xwe tev dikin.

Çemê Çaço di nav gund re kubar kubar diherike. Li der û dora gund du çiya hene, yek çiyayê Kolik e, gund pala xwe dayê; yê din jî çiyayê Qontir e, gund berê xwe dayê. Li ser vî çiyayî ziyaretek heye. Ji berê şênîyên gundên der û dorê jî qurban dibirin ser û serjê dikirin. Lê mixabin di van salên dawîn de ew kesên bêxîretên ku li zêran digerin, ziyaret kolane û tûr tela kirine.

Civaka Ezidî, di sala 1882'an de, ji hêla Eyntabê mişext dibin, tîn vê heremê û di 15 gundên Dîgorê de cih dibin. Ev ji eşîra Sipkî ne. Yemençayîr ji wan gundan yek e. Li gor arşîvên rûsan di Yemençayîrê de, 19 malbat bi cih û war dibin û di van malbatan de, 74 mêr û 60 jî jin hene.

Li wê gavê, malmezînen Yemençayîrê; Esedê Biroyê Cewarê, İvoyê Hemo, Bekîrê Şemo, Basoyê Reco, Hemîdê Hûso, Rostemê Hesen in. Ji van Bekîrê Şemo û Basoyê Reco dewlemend in û ji bo perwerdeya zarên xwe, ders-darên rûs tînin gund.



Şênîyên Yemençayîrê debara xwe bi cotkarî û xwedîkirina heywanan dikin.

Nivîskar Têmûrê Xelîl, di berhemeke xwe de behsa edetkî wê demê dike.

'Li wê gavê, di gundê Emançayîrê de edetek hebûye. Bona ji bextreşîyan û belayan xelas bibin, dora tendûran hinek edetên dîni dikin. Wek; eger zarokek dereng dest bi xeberdanê bike, an jî dereng bimeşe, ji destê zarê digirin, dora tendûra sincirî digerin, sê caran fitil didin û dibêjin: 'Pîrê êgir, îzinê bide bila zarok xeberde'

An jî: 'Ya Pîrê êgir, tu qewatê bide zara min, bila bimeşe.'

Xwediyê zarê xênjî vê yekê, bi destê zarê digire û li dora tendûrê digerin, di ber xwe de dike pintepint û ginegin bona ku zarok jî, mîna wî xeberde û bimeşe.

Di şevên zivîstanê yên reş û dirêj de, şênîyên Yemençayîrê di odeya Esedê Biro de dicivin; behsa meseleyên berê dikin, çîrok û stran dibêjin. Carinan, ji derva jî mevan tevî vê cimûeta wan dibin. Ji wan yek jî, sazband û dengbêjê gundê Qozilcê Kamilê Bekir e. Qozilcê jî gundê Êzidiyan e. Kamilê Bekir sazê bi hostayî lédixê û pê re klam, stran û çîrokan dibêje. Her sê zarên gund ên zîrek û jêhatî; Heciyê Cindî, Cerdoyê Genco û Eminê Evdêl qet ji van şevbêrkan kêr namînin. Dibe ku tesîra van şevbêrkan ku, dema

hersê mezin dibin, li ser folklorê kurdan xebatên pir mezin û giran biha dikin.

Civaka Êzidî 36 salan li vir dijîn. Bi fermaneke nû, di sala 1918'an de, vê carê jî, ji vir koçberdibin, diçin alî Sovyetê. Di dema vê fermanê de, Yemençayîr gihîştîye 40 xaneyî û nifûsa wê devî devî 250 kesî ye. Ji wan, mezin di dema rev û bezê de tîn kuştin, zar sêwî dimînin. Ji wan; Heciyê Cindî, Cerdoyê Genco, Eminê Evdêl hevalê hevdu yên zarokatiyê ne. Li Yemençayîrê bi hev re kap, peskê guro, çavgirtonek lîstine. Her sêk jî, di pey koçberbûnê re dê û bavê xwe winda dikin, di sêwîxaneyan de mezin dibin û xizmetên pir mezin dikin ji bo çand, huner, wêje û hebûna kurdan. Heta roja mirina xwe jî, ev her sê heval qet ji hev naqetin û tim bi hev re tevdiagerin.

Niha jî binaliyên Yemençayîrê kurd in. Gund hêj wekî berê maye, 60 xane dijîn. Nifûsa wê jî devî devî 400 kesî ye. Ev ji eşîrên; ayiza, seydoyî, birûkî, celalî û dilxerî ne.

Li gund, ji çend avahiyên wê demê, hê jî pê ne. Ji wan ku bi navê 'birca belek' bi dipûzena xwe ya berê ve sekinîye.

Nivîskarê nemir Heciyê



Cindî di biranînê xwe de ji bo hesreta yemençayîrê dibêje; 'Ez biçûma Emançayîrê, min dilê xwe rehet bikira, bêhna min vebûya, min ê cih û warên kal û bavê xwe, mala me û kalikên xwe bidîta. Min ê xweliya wî gundî, bi dilê tijî maç bikira. Ew xweliya ku xwişk û bira, pîrik û kalikê min, dê û bavê min, pir hez-kirî lê geriyane.'

Pêşiyên helbestvan Fêrîkê Üsiv jî ji Emançayîrê ne. Ew di heman demê de zavayê Heciyê Cindî ye û bi Firîda Xanimê re zewiciye. Di helbesteke xwe de ji bo ked, millet û welatperweriya Heciyê Cindî dibêje:

*Neçûyî Hecê, lê bûyî Hecî
Çim cimata te, ev misken,
ev cî
Tera bûn ziyaret, tera bûne
Hec,
O tu lê bûyî ziyaretvanê
qenc. . .
Çavkanî:
Heciyê Cindî, Jiyan û Kar: Firîda
Hecî Cewarî
Gotar: Têmûrê Xelîl
Bijare: Fêrîkê Üsiv*



Mertal

Selim Temo



Veger

Firar, feqî, feqîr, sofî, seyda, sinetçî, derwêş, gewende, melle, keçên revandî, mitîrb û rêwî xwe li vê malê digirtin. Deriyê ji dara çinarê her li başûr dinêrî. Deriyê du taq, derfetek bû bo hatina kesên li ser rêyan û reva kurekî nûgihastî ji vê malê.

Ew derî li ser taqê piştê bû. Yê li derve kerem dikirin. Çirûskeka eşîrî hebû li hundir. Tovrîndê deşt û çiyana çong diqraftin û rûdiniştin. Birno, şeşxane, sîtan, çapelî, qurmeli û xencer rêz dibûn li ser diwêr. Qewmê ji çiya û asmên xuliqî li raserî hebûnê diponijî. Yek radibû rextê firarekî dixist nava doşekan.

Dem e, diherike li nav valahiyekê. Êdî nûgihastî yî. Dibêjî wa rastî li derve ye. Dep û hesinan didî nav lingan û diçî. Li pey te zarokatiyeka genimreng dikule.

Tu nabêjî her tişt bi hev re, di heman demê de helake dibin. Balixbûna te bûyîna berşîrekê ye û çilmisîna gulên sordizerde. Rûyê te dibizde di cam û neynikên bajarên dîr de. Yek destê te berdide û wenda dibe li nav bulwareka gewr. Paşî, zengilê kortalan diçûrîse li ber serê berfê.

Radibî, vedigerî wî deriyê çûyîne. Li derazînkê zarokatiyeka genimreng pêşwaziya te dike. Ji nav porê wê pêçiyên pîrejînekê olan didin. Xewneka havînî heye di spîya çavê wê de.

Lê deng ji odeya mêvana nayê. Kesî xwe nespartîye wir. Çiroka xwe nabêje, peyvên xwe nagindîrîne, gewdê xwe di nav valahiyê de naşidîne. Kes nemaye li ser rêyan. Tu dibêjî qey êdî kes naçe bi ti deverî ve.

Bêdengî dixişîşe di xurcezîna demê de.

Odeya mêvana xalî ye. Kes nayê, kesê bê nema. Kesên hatî çûn û venegerîyan. Ew zîman û zîmanên wî zîmanî dianîn zimên bar kirin. Ev zîmanê reeltîr ji hebûnê, ji xuyabûn û wendabûnê, ji reng û bîhna gerdûnê, ji av û axê, ji sebr û deyxê, ji morîna gamêşê xirboz, ji heftrenga baxçê biharê, ji siya keser-daxê, ji zengilzava û nanikê legê.

Hêlîn xera bû. Çilmêreyên pişt û palpiştê deriyê kelehe şikestin, gurzê nehparşû û rîma dozdemovik li ber demê serî tewandin tevî kesên rêdemayî.

Li ber deriyê rîziyayî rûniştî me. Çaryek sedsal berê, pirtûka Abdulla Peşewê gewre çap bûbû bi navê 'Veger.' Roja min dit, li ser bergê di şiklê zêrfê nameyê de rawestiyam û min got, 'veger çî peyveka delal e.'

Va îro diçînge di kefa destê zarokekê niv-sedsalî de.



Wêne: Jonas Daniliauskas, 'Return of a Son' (vegera kurekî)

Îdlîb peynîyê xeyalan o

Mehmet Şahîn

Fina ke ma heme zanê şerê xomîyanê Sûriye 2011'nan de dest pê kerd. Hesabê zaf dewletan ser Sûriye bibî. Yê dewletan re yew dewleta tirk bî.

Dewleta tirk hêvî kerdêne ke di wextê ke kilm de (herî zêde şes aşmîde) rejîmê Esadî bişeyowe û cayê êyde hikûmdariya Îxwanî Misilman awa bibo, şerê camiyê Emewîyan de nimaj bikera û Sûriye bikera bin kontrolê xo û raynê civaka kurd bê heq bê hiqûq û bêstatû bimano.

Qabê nê joyê çî destê dewleta tirk ameyê kerde. Erdnîgarîya Tirkîya bî rayê şîyayîş û ameyîşê çeteyanê Sûriye. Çek û cebilxane û lojistikê çeteyan heme ser Tirkîya ra şî. Her çiqasî dewleta tirk bi heme qewetê xo paştî da çeteyan zî rayna çeteyî bisernêkewtî û waştêka dewleta tirk nêamî ca.

Badê ke serra 2015'ine de dewleta rûs bi awayêko fiilî tewirê şerê Sûriye bî û hetkarîya rejîmê Esad kerde, heme xeyalê dewleta tirk di qirike aye de mendî.

Dewleta tirk vîna ke bê destûrê dewleta rûs nêşikena Sûriye de xo têbida. Mecbûr mende xo bida kiştê dewleta rûs. Bêguman eno ro hesabê dewleta rûsî ke ameyê. Badê ke dewleta tirk û dewleta rûs xo da kiştê yewbînan di beyntarê înan de bazarê lişinan zî dest pê kerd. Dewleta rûs heme çeteyê ke bi ser Tirkîya re şîbî Sûriye bi destê dewleta tirk Îdlîb de day komkerdiş. Yanî bera ke tera amebê sînorê Tirkîya be, coka ra verê heminan da sînorê Tirkîya. Waştê ke bera ke tera amebê ew ca ra veciyê.

Di komkerdiş û wayîrvecîyayîşê çeteyan de hesabê dewleta tirk zî bibî. Nê hesabanê dewleta tirk ma şikenê hina rêz bikerim.

Qabê ke bişika, estbîyayîşê xo yê Sûriye derg û mayînde bikera, maseya çareserîya Sûriye de ca bigera, hesabê xo yê nimcet mendî yê qarşî Esadî tamam bikera, di operasyonên xo yê qarşî kurdan de destûr bigera û her tim miyanê Sûriye de bî, her tim têwirbîyayîşan viraza.

Dewleta tirk waştê ke çeteyê ke Îdlîb de kom kerdê qabê nê hesabanê xo yê ercan û lişinan fina heranê mayîne bikar biyara. Coka ra çeteyan heme Îdlîb de kom kerde û bi awayêko eşkera biye pawitoxê çeteyan.

Di encamê nê bazarê lişinan de dewleta rûs bêbextî ro kurdan kerde. Qada hewayî ya Sûriye balafirane dewleta tirkê rê



Hesabê zaf dewletan serê Sûriye bibî. Çek û cebilxane û lojistikê çeteyan serê Tirkîya ra şîyê. Encamê bazarîyê lişinan de dewleta rûs bêbextî ro kurdan kerde. Dewleta tirk zana ke heke Îdlîb dest ra vecîyo do peynî ro heme xayalanê înan bêro

kerd a û destûrê dagirkerdişê heremê Şehba û Efrîne da dewleta tirkê. Bi dagirkerdişê nê hereman verê çîmanê dinya de bi hezaran kurdî ameyî qetilkerdiş, mal û milkê înan ameyî talankerdiş û hema zî qetlîam û talan dewam kena.

Ma heminan zanê ke badê ke çeteyî heme Îdlîb de kom bibê do peynî de ewcaykera bêrê paqijkerdiş. Bêguman hesabê dewleta rûsî wina bî.

Badê ke dewleta rûs bi destê dewleta tirk çeteyî heme Îdlîb de kom kerde, 17'ê Êlula 2018'î de di şaristanê Soçî de peymanê ke bi dewleta tirkê daye îmzekerdiş. Dewleta rûs di êy peymanî de barêko giran dayr serê milê dewleta tirkê. Verpersiyariya çeteyê ke Yewbînîya Şaran terorîst vîna da ser milê dewleta tirkê û dewleta tirkê kerde hevalbend û pawitoxê înan.

Ez wazena çend xalanê peymanê Soçî biyara şîma vîr;

- Do dormeyê Îdlîbî de bi qasê 15-20 km raştêyêko ke bê çek awan bibo.

- Heta 10'ê Teşrîna verîne heme çekê giranî yê seyt tang, top, hawan û roketan na hereme ra bêrê vetîş.

- Heta 15'ê Teşrîna verîne çeteyê terorîst û yê neterorîstî yewbînî ra bêrê aketermayîş û heme terorîstî herem ra bêrê vetîş.

- Heta 31'ê Kanûna 2018'an rayê M4 û M5 bêre akerdiş.

- Ganî çeteyê Îdlîbî tena Îdlîb de bimanê û tenê heremane xo bipawê. Yanî heremî

bimanê.

Belê xalê peymanê Soçî yê muhîmî enê bî. Dewleta rûs ke zana û ma heminan zî zanê ke dewleta tirk nêşikena nê xalan yew biyara ca û nêarena ca. Çimkî dewleta tirkê nêwazena şer û aloziya miyanê Sûriye bi awayêko baş û aşt biqedîya.

Dewleta tirk bi ser de xalê peymanî ya herî muhîm a ke vatê "hewco çeteyî tenê herema Îdlîbî de bimanê û tenê heremî bimanî" bin lîng kerde. Dewleta tirk çeteyê Îdlîbî sey leşkerê xo bikar arde. İnan ra bi qasê 15 hezarî çeteyî sewqê Girê Spî û Serêkanî kerde û bi hezaran çeteyan sewqê Lîbya kerde. Îdlîb xo rê sey çimeyê çeteyan û leşkerê bi pereyan bi kar arde û arena.

Heme dinya zana ke Îdlîb biya golê çeteyan. Heme vermendê DAIŞ, El-Qaide, El-Nusra û heme çeteyanê bînan ewca kom biyê û se ra 90ê din bin kontrolê çeteyanê HTŞ (El-Nusra) de yo. HTŞ (El-Nusra) dewleta tirkê ke miyan de hetê heme dewletan ra û Yewbînîya Şaran ra sey rêxistinêka terorîst yena vînayîşê.

15 aşmî ser peymanê Soçî ra derbas bî û dewleta tirk yew xalê nê peymanî nê arde ca. Dewleta rûs fam kerde ke niyetê dewleta tirk cuda yo û yew xalê nê peymanî nêarena ca û do nêara ca. Coka ra karo ke 15 aşmî yo pawê dewleta tirk bî, nika dewleta rûs kena.

Îdlîb şaristanê dewleta Sûriye yo. Artêşa Sûriye wazena bi hetkarîya dewleta rûs û İrani, Îdlîbî çeteyan û terorîstan ra pakî bikera. La dewleta tirk înan ra vana şîma nêşikenê di şaristanê xo de qarşî terorîstan operasyon virazê û dest bidê çeteyanê mi. Dewleta tirk qabê ke hêrişê rejîmî vindarna, çî dest ra yena, kena. Bi hezaran tang û top û çekê xo yê tewr giranan sewqê Îdlîbî kena, heta

nika zêdeyê 6 hezarî leşkerê xo rêşawita Îdlîb û hedrekarîya şerî kena.

Dewleta tirk zana ke heke Îdlîb dest ra vecîyo do peynî ro heme xayalanê înan bêro. Zana ke, heke Îdlîb dest ra vecîyo nêşikenê Efrîn, Serêkanî û Girê Spî de bimana. Heke Îdlîb dest ra vecîyo do nêşika destê xo bikera miyanê şaranê Sûriye û aloziyan xorî bikera. Heke Îdlîb dest ra vecîyo do nêşiko Sûriye û rûsî reyde bazaran bikera, do nêşika xoserîya kurdan çinêbikera û do nêşika qabê hêrişê kurdan destûr bigera.

Bi kilmî ma şikenê vajim ke hêrişê Rûsya, İran û artêşa sîrî rûpoşê hikûmeta tirk fino erd. Bi awayêko zelal eyseno ke vatîşê rayedarê dewleta tirk ê "ma yewparetiya Sûriye wazenê, ma gorî mutebaqatê Adana qabe çinêkerdişê terorîstan ewcê ..." heme zûrî yê. Dîyarî ke dewleta tirk qet nêwazena Sûriye ra vecîya û Sûriye de aramî virazîya. Wazena terorîstan bipawa û dewleta Sûriye parçe bikera û ê parçeyan bi Tirkîya girê bida.

La qewetê dewleta tirk a ke bişika qarşî Rûsya, İran û Sûriye şer bikera û Îdlîb de bimana çinî ya. Rayedarê dewleta tirk zanê ke henî çîyo ke bikerê çin ya û neçarê ke ê Îdlîb ra veciyê teber. Coka ra bi sewqkerdişê çekê giranan û leşkerî wazenê veciyayîşê xo bikerê babetazî û tay tawîzan înan re bigerê û hema veciyê.

Dewey Ma



Cemil Oguz

cemilo@diyarname.com

Xêzê reyan, xezê însanan

Her teno/a erebe rameno/a hay xêzanê reyan esto/a. Enî xêzê ke serê reyan de hameyê viraştîşî zehf muhîm ê. Ê nêbê go her qezay viraziyê û însanî bimirê. Ê xêzê jiyaney zehf merdiman xilas kenê.

Versiyono joyîn ana vano: Edward Norris Hines endamê Komîteya Trafîkî ya Wayne Country a eyaletê Michigan a Amerika de bî. Reya joyîne ê xêzê reyan ê kifş kerdî. A komîte reya joyîne xêzê spey serê rey de xêz kerdî û rey kerde di cay. Erebyke şitrotîşî wexto reya şîne, şitê cê rişyawo û ene joy ra Hires fikirîyawo ke xêzanê reyan virazo.

Hines, ke karê bisqilêtan kerdê, Michigan de qeybî reyan bikero hîra organîzasyonê Good Roads viraştî. Ew Serokê Klûba Bisqilêtanê Detroit Wheelmen biyo. (Ê di serey 1909'ınan de qeybî peyan jî rey viraştî, la ene meselay ma niya)

Semedê xizmetê yê qey reyan di serey 1935'ınan de Xelatê George S. Bartlett dayê Hines.

Rîwayetê ke bin jî vano ke cotkarêke îngilîz her çiqayke erebeyê çinêbî jî her River Road ra şîne, û ê xêzê rey pêşniyar kerdê. Di serey 1911'ınan de li ser reya River Road a nîzde Trentonî ceribandîne xêzey reyan hameyê kerdin.

Însanan her game qeybî rehetî xo çî vetê û dewam kerdê.

Meselaya xêzê reyan jî ana bî û heta eyro ana dewam kerdê.

Eyro bi taybetî miyanê şeheran de xêzî zehf muhîm ê. Cayke xêzî çinêbê zehftir qezay benê.

Xêzî miyanê jiyaney însanan de muhîm ê. Her merdim mecbûr o wayîrê xêzan bo. Xêzî rey mocnenê ra, xêzî edalet mocnenê ra. Gamêke wet beno bêedaletî, gamêke nat beno edalet. Ti çîya ra xêze ancenê, ew muhîm o.

Bi sedan seran kurdan sedemê xêzan zirar vîna, dec vîna, hameyê kiştîşî.

Xêzê pîlî miyanê mehla, miyanê keye, miyanê dewanê înan ra heme antîşî. Babîke eno hetê xêze, jo ew heto bin mend. Jo bî "binxet" ew bin bî "serxet". Kurdan jî her waştê ê xêzan xirabîkerê, miyanê x ora wedarê.

Di ene se sera newî de reyna xêzî yenê antîşî. Go xêzê newey çî biyarê serê kurdan? Kurdî go çîqa beşkê tesîr ro xêzanê neweyan bikerê? Persî meydan de yê, la kurdî çîya yê?

Jiyaney merdiman de reya newî, xêzê newey ke serde hameyê xêzkerdişî û dimara jî erebey newe û şofêro baş eşkeno merdina bero her ca. Çîya biwazê, kamco seyran, kamco dew, qeza, bajar, kamco welat? La egîr rey to rast e nêbo, xêzê to çinêbê, erebe û şofêrê to endêke jîr nêbo go sebo?

Welhail xêzî hema ca, heme gameyê însanan de muhîm ê. Ê çîyo zehf muhîm jî ma enî xêzan gorey jiyaney xo, bi rengêke sipê xêz bikerê.





Feydeya jixewrabûna zû

Kurikê nû dest bi dibistanê kiribû û serê diya wî pê re ketibû belayeke mezin. Serê sibehê diya wî deh caran gazî wî dikir, bi qurban û heyran ew ji xew radikir lê dîsa her roj dereng dima.

Diya kurik xwe avête bextê mamosteya xwe û jê re hal û meseleya xwe got. Mamoste got tu wê ji min re bihêle ez ê çareser bikim.

Mamoste dest bi dersa xwe kir û ji zarokan re got ez ê îro çirokeke der barê feydeyên jixewrabûna zû de ji we re bêjim.

Mamoste dest bi çiroka xwe kir û got çivîkek biçûk hebû ew dereng ji xew radibû û birçî dima.

Rojekê ew çivîka biçûk beriya her kesî rabû û ji xwe re kurmîkek dît. Beriya ku diya wê ji xew rabe çivîka biçûk kurmik xwar û zikê xwe têr kir.

Paşê jî mamoste berê xwe da kurikê biçûk û jê re got: "Te dît gava mirov zû ji xew radibe, mirov feydeyeke çawa dibîne."

Kurik ji mamoste re got: "Na ez tevli



te nabim, heke ew kurmik zû ji xew rabe zûbana nedibû nêçîra wê çivîka

birçî." Mamoste nema zanibû çî bersiva wî bide û qet dengê xwe nekir.

Qedeha plastîk



Carekê jinek ji mêrê xwe yê cîr-nexweş xeyidî û çû mala bavê xwe. Mêrik gelekî poşman bû, bi şaşiya xwe hisiya û sed hêvî û rica kir lê jinekê got ez êdî nema vedigerim mala te. Piştî çend qasidan jinekê qebûl kir ku vê carê bersiva telefona wî bide. Qasid hat û mizgîniya xwe ji mêrik xwest û got tamam tu karî bi telefonê lê bigerî û lêborîna xwe bixwazî. Ew çî ji te re bêje gerek tu bêjî erê. Mêrik telefonî jina xwe kir, jinekê jê re: Qedeh li kêleka te heye.

Mêrik: Na tune ye.

Jinik: Here qedehê bîne.

Mêrik: Temam min anî.

Jinik: Wê qedehê li bin guhê erdê bixe bila parçe bibe.

Mêrik: Temam min qedeh avêt.

Jinik: De here îca wan parçeyên qedehê bide hev û wê bike wekî berê. Heke tu dikarî qedehê bikî wekî berê ez ê jî vegerim malê.


Mêrik: Qedeh wekî berê ye tiştêk pê nahatiye.

Jinik: Çima qey qedeh neşikest?

Mêrik: Na keçê qedeha plastîk bû ma wê çawa bişikê.

Jinik: Xwedê emrê te dirêj neke, tamam heyra ez ê vegerim lê tu yê soz bidî ku careke din dilê min nehêlî û tu şaşiyan di heqê min de nekî.

XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Ava ku ji laşê mirov der tê.
2. Redkirin, neyînî.
4. Hesinê ku pê kevir tîn şikandin.
6. Sewalek kedî ye, mirov ji şîr, hîrî û gostê wê sîd werdigre, mêşin.
7. Darek e ku li ber newal û çeman şîn tê.
8. Di dabeşkirinê de ji her parçeyên dabeşbûyî payek.
11. Kesê ku erd bi ga, bi hespan an jî bi makîneyê diajo, kesê karê cot dîke.
14. Kesê hêmin, bêdeng.
16. Mîna, nola.
19. Cihê ku mirov tê re dikeve avahiyê.
20. Kesê sêyem ê yekjimar, kesê sêyem ê pirjimar.
21. Teyrekî behrê ye.

JI JOR BER BI JÊR

1. Herî, bermahiya agir.
3. Tişt an jî cihê/erdê ku av tê de heye, biav e yan jî erdên ku tîn avdan, xwarina ku ava wê zêde ye.
5. Teyrekî pê nêçîra çûkan û kêrgoşkan tê kirin.
6. Rewşa rû û dirbê mirov.
7. Liv û tevgera hewayî.
8. Roja beriya duh.
9. Riya avê, cihê av tê re diherike.
10. Kincek e ku ji risê stûr hatiye çêkirin.
11. Dextlek e, bêhtir dibe alifê sevalan.
12. Qetek ji bendê pembûyî, ji hiriya mihan û mûyê bizinan çêdibe.
13. Rewşa sermayê, germê, şilî û hişkayiya rûyê erdê.
15. Ronahiya agirî, ronahiya rojê, lamba û hwd.
16. Cinavka kesê sêyem ê yekjimar û nêr.
17. Nişaneyên dirûnê.
18. Wesleyekî cestê mirov û ajalan e.

Kurd tune ne kurdî qet tune ye

Xwedê bela xwe bide we lawo welehî we em jî bi xwe re gêj kirin. Niha madem kurdî heye kurd jî hene. Madem kurd hene kurdî jî heye. Madem kurd û kurdî hene wê gavê Kurdistan jî heye.

Lê ji bo gotina pirsgerêka kurd ez tenê di vî alî de tevli nêrîna we dibim, bi rastî jî pirsgerêka kurd tune ye. kurd tu caran nabin pirsgerêk, tiştê ku heye pirsê kurd e û divê ew pirs were bersivandin. Kurd gelekî kevnan in. Zimanê wî kurdî ye. Li ser axa xwe dijî û navê welatê wî jî Kurdistan e.

Jixwe li dadgehên yekcar ev mesele sosretir dibe. Dema ku mirovek dixwaze bi kurdî bersiva xwe bide, di tomarkirinê de wekî 'zimanekî nayê zanîn' derbas dibe. Îca gelek caran li gor wê îfadeyê ceza jî didin. Madem ku 'zimanekî nayê zanîn' e hûn çawa dizanin çî dibêje û ji bo çî ceza lê dibirin?

Wekî berxê li ber maka xwe

Veysi Varli

Ev çend roj in li ser med-
yaya civakî û di hin televîzyonên
tirk de behs û qala xortek bi navê
Murat Akbaşlı ye ku ji Wanê ye tê
kirin. Ev xort dema karê xwe yê
siwaxa xanî dîke stran dibêje û ev
stranbêjiya wî li ser tora medyaya
civakî belav dibe û bi aweyekî
dighêje hunermendê muzîka Tirkî
Zulfu Lîvanelî. Li gor peyamên
ku hatine belavkirin, em tê digihê-
jin ku piştî Zulfu Lîvanelî dibêje
ev xort xwediyê dengê û hunerê
hêja ye, gelek kes û sazî dikevin
nava lêgerîna wî xortî. Min jî
xwest terza stranbêjiya wî xortî bi-
nirxînim. Bi xêra Murat dengbêjî
ket rojevê û ez jî dixwazim li ser
mijarê çend tiştan bibêjim. Em di-
zanin ku wekî ya her neteweyî,
bingeha çanda kurdî jî ziman û
muzîka kurdî ye. Û muzîka kurdî
wek sê cureyan tê dabeşkirin:

1- Bi pîvan (Tempo Quisto),
stranên xwedî ritma bi rûkûpêk,
ango ritmîk in.

2- Bê pîvan/serbest, stranên
xwedî ritmên serbest û bê
pîvan in.

Dema ku em bi nêrîneke za-
nista muzîkê li van stranên bê
pîvan û xwedî ritmên serbest binê-
rin, tê dîtîn ku ev stran xwediyê
rîtmêke veşarî, navberên diyarkirî,
perdeya biryarê ya diyarkirî û ge-
reke diyarkirî ne. Stranbêjê stranê
dikare hest û ecibandînen xwe tê
de bihûne. Ji ber vê sedemê jî ni-
vîsandîna notayên stranên xwe-
diyê ritmên serbest û bê pîvan
gelek zor û zehmet e. Muzîka ku
gelên rojava (ewropî) jê re dibêjin
“Parlendo Rubarto an jî Parlendo
Resîtatîfe”. Her çiqas ew jî xwedî
pîvanêke serbest be jî di warê ger,
navber, rêsi û haweyê de tu têkilî-
yeke wê bi muzîka kurdî re tune
ye û hev temam nakin. Dema
stran tê gotin, di stranê de trîole
(sêyênî) gelek zêde tê bikaranîn.
Stran xwediyê trîlên (lerzandina
gewriyê) taybet e. Di stranê de
şekên senkopa yeksan (di stranê
de rîtmêke wekî reva lingê
hespa li bezê xwe dide diyarki-
rin) kadans û seknên ku xwedî
maweyên serbest in û bi puan-
dorgê di notayê de tînen nîşandan,
timik tê bikaranîn. Stran bi tek-
nîka terzên Slabîk, Melîzmatîk
û Hîbrîd (melîzma û slabîk di
nav hev de) tînen strîn.

Terzê Slabîk: Ev terz nêzî
(Resîtatîf an jî Parlendo Resîtatîf)
axaftîne ye. Li ser her notayekê
kîteyêke peyvê cih digire. Bi şek
an jî bê şekiya kîteyê di heman
demê de dibe sedema ku ev terz
bibe du cureyên cuda.



Nêçîrvanên dengên kurdî vê carê jî li pey deng-
bêjê ciwan Murat Akbaşlı ketine. Murat wekî
berxikê li ber maka xwe li gund xwe diparêze. Ew
jî li bendê ne ku ji refê xwe dûr bikeve

- a. Slabîka bê şek
- b. Slabîka bi şek

Terza Melîzmayê: Taybet-
mendîya vê terzê ya herî diyar, li
ser notaya xwediyê yek kîteyê
seknêke bi îsrar û mawedîrê a bi
trîl (hûnandin/lerzandina gew-
riyê), nîgar û rêsiyên stranê heye.
Kîteyê li ser gelek noteyan cih
digire. Lê stranbêj dema stranê di-
bêje peyva kîteyê dirêj dike, li
gor devoka xwe tîp an jî kîteyên
wekî (î, û, e, wê, we, wa, hê, yê)
bi kîteya gotinên stranê ve wek
xemlekê girêdide. Yek caran nê-
zikiyê li slabîkê (wekî axaftîne)
bîke jî stranbêj bi nêwî, bi nîga-
ran, bi rêsiyên nuhrandîni stranê
dixemilîne.

**Terza Hîbrîd (Têkel/Tevli-
hev):** Tevahiya taybetmendiyên
terza slabîk û melîzmayê di nav
hev de cih digirin. Di muzîka
kurdî de herî zêde ev terz tê bi-
karanîn. Stran dibe ku bi slabîkê
dest pê bike û bi melîzmayê bi-
dome. An jî bi melîzmayê dest
pê bike û bi slabîkê bidome.

3- Bi rîtmîka sist (bi rîtmîka zê-
marî).

Stranên ku tê de rîtmên bi rê-
kûpêk hene lê veşarî û sist in.
Ango xwe wekî stranên serbest
dide diyarkirin. Kesên van stranên
dibêjin dengbêj in. Dengbêj li gor
jiyan,rewş û pêkanîna hunera xwe
jî bi çend cureya tînen dabeşkirin.

Piştî van pênasîyên em veşarî
mijara xwe. Gelo stranbêjiya
Murat çawa ye ka em lê binêrin.

✓ Di warê postur, bihngirtîne
(ya venêhartî û ya revokî) de ji se-
dema di nav kar de ye zêde lê
nehat nêrin. Di warê nefesê de
xwedî nefesek baş e û di strangoti-
nêde jî baş bi kar tîne.

✓ Di dengê xwe de rezonansek
kûr ango bi gelek lertzên li paş
lerza ewilî pêk tîne û bi rast pêka-
nîna bandora diran, lêv û valahiya

devê xwe de dide der.

✓ Her çiqas dengê zarok den-
gek serhedî (dengê serî) be jî ban-
dora sînga xwe li stranên xwe
dike, ji ber vê jî dengê nerm di-
kare pêk bîne.

✓ Dengê bi kar tîne dengê ser-
hedî ye. Ango dengê valahî ya serî
ye. Ev deng jî dengê zîz e. Bi pi-
ranî dengê stûr û nerm di valahiya
binê rezonansa gewriyê de, yê tîz
jî ji valahiyên ser rezonansê de bi
kar anîye û dema devê xwe vedike
û diqîre ev pir hêsan tê ferqkirin û
dîtîn (lê mixabin ev taybetmen-
diya dengê serhedî ye, ev xort tenê
vêya pêk nayne).

✓ Di warê şixulandîna amûrên
artilasyonê de (Yên tevdigerin:
çene, lêv ziman û panîka dev ya
nerm. Yên tevnagerin: Diran, pi-
diyê diranan û pankî dev.) hin
cara lawaz dimîne, ji wê sedemê jî
wekî detonebûnê hîsek dide der.

✓ Di warê rastaxaftîne/diksi-
yonê de ne zelal e. Pisgirêka pro-
zodiyê dijî. Ango bikaranîna
peyva li gor xwesteka hest, raman,
şeweyê baş bi kar nayne. Şek, ki-
nahî û dirêjahiyên peyvê ne li gor
deng bi kar tîne.

✓ Sedema ku di xebatê de
stran dibêje fonasyon ne diyar e
(dema bihngirtîne nefesa ku li
têlên deng dikeve û bi lerza têla
dengê ku derdikeve devre ye)

✓ Deng girtîna xwe (fokus/nîs-
kok) rast bi kar tîne. Ji wê sedemê
dengê wî nabetlîne û nasincrine.

✓ Di etnonasyonê de hinek
lawaz e (xeta melodiya gotîna
peyvê. Dema stranbêj etnosyonê
rast bi kar bîne hîs û ramanên xwe
yên xof, matmayîni û hêrsê bi
guhdarvan hêsan dide xuyakirin).

✓ Nuansên dengên xwe bi hê-
sanî bi kar tîne. Di navbera perde-
yên zîz û nerm (pest) de bi hêsanî
diçe û tê, rast pêk tîne.

✓ Di strangotîne de wekî her

Çanda dengbêjiyê

Di muzîka kurdî de beşa deng-
bêjiya dîwanê, di zik xwe de;
zanista civakê, feylosofî, wê-
jeya devkî û mîsyona siyasî û
dîrokî bi hunerî diparêze û
dide der. Bi sedsalan e kurda
peyva “gotin diçe/difire lê nivîs
dimîne” bi hunera dengbêjiya
dîwanê belewacî kirine û bi
stranên xwe li nav milyonan
belav bûne. Mirov dengbêjê
dîwanê tenê wek huner-
mendek muzîkê nikare pênasê
bike, sedem jî ew e ku dema
dengbêj klam dibêje, hin caran
wek çirokbêjek, hin caran jî
wek lîstikvanek şanoyê tevdî-
gere. Û her yek ji wan bi stran-
bêjiya xwe di heman demê de
parêzvanên ziman, vêje û
şanoyê ye jî. Çend cureyên
dengbêjiyê ev in;

- 1 - Dengbêjên mîr û began.
- 2 - Dengbêjên gerok ên nav
gel.
- 3 - Dengbêjên dîlanê.
- 4 - Dengbêjên amûrjen.
- 5 - Dengbêjên bê amûr.

dengbêjê/a kurd terzê hîbrîd (sla-
bîk û melîzmatîk) baş bi kar tîne.
Di tîpên dengdar de legato yê qut-
bir nake, peyvên stranê diherikîne.

✓ Di stranê de steqatoyê qasî
legatoyê baş bi kar nayne. Cihê ku
lazim e peyv bi resîtatîf û her kîte
ji hev kutbir were bikaranîn, li hev
suwar dike û gelembolek tê holê.

✓ Di strana gotiye de glişendo
ne diyar e (deng nehatiye kişan-
din/kêşkirin).

✓ Di stranên xwe de trîl gelek
caran rast bi kar anîye.

✓ Li ser perdeya dema pêwîst
bûye vibrasyonê bi kar anîye.

Dema ku mirov li tesbîtên li
jorê dinêre her xortek serhedê
(Wan, Mûş, Agirî û hwd.) kêm
zêde xwedî heman rengê deng in.
Ango zêdehiyek Murat Akbaşlı ne
pir diyar e. Lê gelo ji bo çî ev
ewqas bûye mijara medyaya ci-
vakî û populer bûye. Ji bo çî Zulfu
Lîvanelî û Mahsûn Kirmizigul
methê wî xortî dikin. Li gor min
çend sebeb hene lê ya girîng ev e.

Li gorî agahiyên ku min wergir-
tîne piraniya xebatkarên çandê wî
nas dikin û li ser Murat nasekinin.
Ger ji sazîyên me bin ger jî ji
xwesteka Murat ya ku demek berî
demek bibe hunermend û populer.
Terzên sazîyên me yê bi vî rengî
tenê ne li Wanê li gelek ciyan xwe
dubare dikin. Lê rovî her tim xwe
dide ber quçê disekine ku berxek
ji çolê pez biqete ew jî bigire jî
bibe bike firavîna çêlikên xwe.
Yên ketine pey Murat xwediyê wî
hişî ne. Peyva xwe ya paşîn bibê-
jim; xortê hêja rovî xwe dane ber
quçê tu jî wekî berxikek ber maka
xwe yî. Rovî xwe dane benda te
ku tu ji refê xwe dûrkevi.

Ji Delav



Feratê Dengizî

Hecî Şerîfa

Dema we xweş be.

Pêşî ez kêfxweşîya xwe ji bonî “Xwebûn”ê bînim ser
zîman.

Dilê min xweş dîke û berdevamîya rojnemeyên kurdî bi
serê xwe serkeftînek e. Her çiqasî rewş ne li gorî dilê me
be jî, berxwedana “bebûn” û herbebinê bîxwe ne tiştêkî
ji rêzê ye, di van şert û mercan de.

Divê di serî de em “xwe” bin. An na di jîyanê de em ê
pêş nekevin. Xwebûn, nîşana serkeftîne ye. Em “Xwe-
bûn”a xwe biparêzîm.

Ez ê jî bi nivîsên xwe, ji îro pê ve bi qasî taqeta xwe,
fikir û ramanên xwe bi ceribînan parve bikim. Hêvîdar
im em xwebûna xwe tekûz bikin û bîm kêfxweş bin...

Keremkên nivîsa pêşî.

Bi hêviya azadîyê...

Me go em seriyekî bidin dostên xwe yê qedim.
Ew çûbûn aliyê din, zaroyên wan mabûn.
Me silav da Brahimê Corc.

Mêrdinê xweş Mêrdinê, şişik kebabên wê,
soqilbeqer û zêrkerên wê qedim, qedirnas,
cansivik, devliken û xwedî hewayek nenas,
ango mitolojîk, nostalgîk û bêhnderin in.
Tew bêhna qehwê, de ka bisekinin. Dizanim
min pir dirêj kir. Lê va mesele ev e.

Em li dikana dostên qedim î suryan
runîştibûn û me qehwaya xwe ya Mêrdinî hêdî
hêdî vedixwar û piştî gotinê dişikand. Yexti-
yarek ket hundir û silav da û yekser got;

Ka Brahim?

Were keremke Brahim ez im.

Na lo. Ma ev der dikana Brahim e?

Were Hecî, ma te ez nas nekirim?

Brahim tu yî, ma lawo ne hiş maye, ne jî
çav dibinin...

Piştî xêrdan, xweşbêş û halpîrsinê em li
sohbeta wan guhdar in û awirên min wisa li
ser Hecî ne. Bala hevala min jî li ser.
Dixwaze tiştinan jê bipirse. Min çav lê şikê-
nand û ew sekinand ku rewşa xwezayî ya
hestewariya wan xera nebe.

Derdora 85-90 salî, çav hûrik bûne û tev
şilaq. Bejnurt î piştikubik. Kum li serî, rîh
zêde nêdirêj, lê simbelê sor î qermîçî der-
heqê xortaniya wî de îşaretna dide. Bêvil
weke nikulê qertel î xwar. Qermûçikên rû, bi
ser hev de badayî, weke rêza qalikên daran
îşaretên temen in. Dest jî qeşartîna gwîzan
reşqermîçî. Awirên wî, bavo awirên wî...

Ka Hecî Ehmed derdê te çiyê? Halê te
çawa ye?

Ma wê hal çawa be lawo? Hecî Şerîfa çû,
ez wilo hiştim...

Yekser hêstir ji çav bariyan, weke barana bi-
harê û çav wisa li nixteyekê dinêrin. Çend de-
qîqe bêaxaftin... Brahim da ser, li ber dila da.

Mirin emrê Xwedê ye.

Tu dizanî bîkesim...

Û sîng hilkişîya û daket bi keser, wisa
melûl, stûxwar...

Paşê em ê fêhm bikin ku bêkes e, Hecî
Ehmed. Hevsera wî Hecî Şerîfa jî çûye ser
dilovaniya xwe. Dema ku diçûn Heca Pîroz,
bi hev re pereyên xwe tev disipartin Brahim,
yanî yekî xiristîyan, xaçperest ango “file...”
De were, îja ji hatina xwe ya sala îsal, gwîz
pir bi bereket bûn, hatina wî pereyekî zêde(!)
danî cem û lê zêde kir;

Ku ez bimirim tu yê wî pereyî bidî Camiya
Mezin kiriv, bila ji camiyê re xerc bikin.

Em li camiyên tev, li gişkan bi wekhevî
parve bikin, digot kirivê Brahim...

Û xweşşobetê bi îskeîska Hecî Ehmed
didomand;

Aax... Hecî Şerîfa... Çima tu çûyî... Te
ez bitenê hiştim..!

Mêrdin, Kirivê Brahim, xaçperest, suryan,
Hecî Ehmedê Bisilman, kurd, dostanî, bawerî û
di vê sala ku xwîn dibare de li Rojhilata Navin,
xwîna li ser navê ol û nijadê... Mêrdin, tu
qedim î, Hecî Şerîfa, Hecî Ehmed, Brahimê
Corc... hûn pîroz in, pîrozên mirovahiyê...

Aaxx... Hecî Şerîfa, ax!



WÊNEYEKÎ KU GELEK TIŞTAN VEDIBÊJE

Biroyê Heskê Têlî

Rohat Alakom



Di salên 1990'î de dema min di derbarê xebata xwe ya bi navê *Rêxistina Xoybûn û Serhildana Agiriyê* de zanyarî û dokument berhev dikirin, ez rastî wêneyên cihê yê pêşengên serhildanê hatim, lê belê min tevî gelek hewldanan wêneyekî pêşengê serhildanê yê giring Biroyê Heskê Têlî peyda nekir.¹ Xebatên min berdewam kirin. Xwendevanan jî wek min sedî sed xwestiyê vî kesayetiye kurd ku li ser gelek tê dengkirin bi wêne be jî bibîne. Em hemû zaten giringiya nepenî ya wêneyan baş zanin.

Dema min berî heftekî ev wêneyê dîrokî ligel çend notên kurdî bi rêya Twitterê weşand min dît ku bi sedan kesan kêfxweşiya xwe nîşan daye. Ev yeka bêguman ez jî dilşa kirim.²

Wêneyê fermandarê kurd

Carekê dema min li nivîseke ku di kovarekê de derketibû mêze dikir, li wir çavên min çûn li wêneyekî asê bûn û min bawerîya xwe bi çavên xwe neanî! Di wêne de du kesên çekdar ku piştî xwe spartibûn berpalên Çiyayê Agiriyê xuya dikirin. Nota ku di binê wêne de hebû zêdetir ez dilşa kirim "*Zilan Beg ligel fermandarê hêzên kurd li Agiriyê İbrahim Heskê Têlî*".³ Belê, Biroyê Heskê Têlî û liderê ermen Ardeşes Muradyan ku alîkarî daye Serhildana Agiriyê tevayî poz dane. Ev wêne çî demê jî aliyê kê ve hatiye girtin, orjînalê wê niha li kîderê ye em nizanin. Ez hêvî dikim ku bersivên van pirsan û yê wê wek van rojekê bîn dayîn. Ev wêneyê ku berî 90 salan hatiye girtin bona dîroka kurd çavkaniyeke dîtbarî pêk tîne. Wêne herwiha dostaniya dîrokî ya kurd û ermenan ku bi salan li hemberî zîlm û zordestiyên tekoşîn dane bi awayekî watedar sembolîze dike. Eger ev dostaniya dîrokî tune bûya, belkî jî ev wêne heta rojên îroyîn nedihat.

Berî em derbasî mijara Biroyê Heskê Têlî bibin kêrdar e ku em bi kurtî be jî çend agahiyan der barê Ardeşes Muradyan de bidin. Di hin çavkaniyên kurd de ew wek "*Zilan Beg*" tê zanin. Di biranînên İhsan Nuri Paşa de ku pêşiyê bi fransî derketine wêneyek heye ku İhsan Nuri Paşa û Ardeşes Muradyan nîşan dide.⁴ Piştî çil salan Garo Sasunî di sala 1969'an de di pirtûkeke xwe de dîyar dike ku navê Zilan Begê yê rastîn Ardeşes Muradyan e, jî Xînosê bûye. Garo Sasunî paşê dîyar dike ku Ardeşes Muradyan bûye goriyê "*Kemîneke Bolşevîkan*" û hatiye kuştin.⁵



Biroyê Heskê Têlî, fermandarê hêzên kurd li Agiriyê (li rastê) û Zilan Beg (Ardeşes Muradyan) li çepê

Dengê tîfinga Biro

Serhildana Agiriyê kê-m-zêde bi qasî pênc salan berdewam kiriyê (1926-1930). Yek ji wan pêşengên serhildanê Xalis Beg di hevpeyvîneke xwe ya ligel rojnameya Vatanê (1953) dîyar dike ku Serhildana Agiriyê bi zordestî û êrişên li hemberî malbata Biroyê Heskê Têlî dest pê kiriyê.⁶ Peyvên herî pesindar di der barê Biroyê Heskê Têlî de ji aliyê fermandarê Serhildana Agiriyê İhsan Nuri Paşa de hatine gotin: "*Tevî erîşên mezin dijmin nîkaribû Biroyê Heskê Têlî ji cihê wî bilivîne. Tenê û tenê ecêl dikaribû dengê tîfinga Biro bide birinê*".⁷ Nivîskar û geroka İngilîz Rosita Forbes ku di sala 1930'î de hatiye hêla Agiriyê Biroyê Heskê Têlî wek "*Lehengê Çiyê*" (Agiriyê) dinavîne. Paşê der barê wî de wiha dibêje: "*Wî karibûye di eynî wextê de ji sê hêlan ne kêmtir bê tengasî cengan bike*".⁸ Pirtûka wê di sala 1931'an de dema Biro şehîd ketiye, derketiye! Çend sal şunda eynî pirtûk bi swêdî jî hatiye weşandin. Di pirtûkê de navê Biro wiha derbas dibe: "*İbrahim Agha Huskê Tella*".⁹ Ronakbîrê ermen Garo Sasunî di xebateke xwe de dema navên serekên Serhildana Agiriyê dide, wan wiha rêz dike: "*İbrahim Heskê Têlî Paşa, İhsan Nuri Paşa û Zilan Beg*".¹⁰ Garo Sasunî, Biro wek "*Şêrê Araratê*" dide nasîn.¹¹ Heta niha jî mirov nizane gora wî li kîderê ye.

Li devera Makûyê tê kuştin

Biroyê Heskê Têlî (İbrahim Axa) di roja 26/6/1931'î de li devera Makûyê jî aliyê hêzên İranê ve tê kuştin. Mijara kuştina wî di biranînên sefirê Tirkiyeyê li İranê Husrev Gere de jî cih girtiye.¹² Têkoşîna wî ya ji destpêkê heta dawîya serhildanê (1926-1931), kuştina wî ya bi hovane û nedîyarbûna cihê gora wî di dawiyê de Biro di nav gel de dike destanek.

Dibe mijara berhemên kurdî

Biro jî aliyê helbestvan û nivîskarên kurd de dibe mijara berhemên wek helbest, serpêhatî û roman, gelek tê girisandin, berz kirin.¹³ Helbestvanên kurd ên wek Cegerxwîn û Osman Sebrî mirinê layiqî Biroyê Heskê Têlî nabînin û mirina wî qebûl nakin. Wek mînak Cegerxwîn wiha dengî Biro dike: "*Heso Têlî Bîrahîm Beg tu rabe / Li zozanê Araratê xuya be*".¹⁴ Osman Sebrî jî di serpêhatiyêke xwe de jîneke kurd li ser gora Biro dide axaftin: "*Rabe bilive gor ne cihê te ye*".¹⁵ Biroyê Heskê Têlî dibe mijara romaneke nivîskarê kurd Yilmaz Çamlıbel jî.¹⁶

Biro dibe stran

Di straneke kurdî de ji mijara kuştina vî qehremanê kurd derdikeve pêşberî me. Per-baskên nefereî jînin ên malbatê şkestine:

"*Qudretê qışîkê, Rabayê rebenê, kes tunine cinazê Bîrahîm Axa, Eyîp Axa têxe nav nivîne*

Qanûna Ecema qanûneke çep e, cinazê wan li İranê li Kışmîş-tepe li ber tava havîne

Kes tune van maqûla têxe nav nivîne".¹⁷

Di vê stranê de gel an jî dengbêj naxwaze Biro têxe bin axê "vê havîne", bona bedena wî zêde neêşe dixwazin dayîn "nav nivîne!". Peyvên havîn û nivîn ku li wir kafiye pêk anîye wek metafor tiştine din jî îfade dikin. Bi peyva havîne germahiya şer, zilma dijmin, bi peyva nivîn jî dengbêj xwestiyê dilovaniya (şefqet) gel nîşan bide.

Ruhê wî li Çiyayê Agiriyê ye

Neviyê wî Cevdet Çokdil di hevpeyvînekê de dîyar dike ku ji malbata wan kesên mayî piştî binke-tina Serhildana Agiriyê bi derxistina qanûneke sîrgûnê di sala 1932'an de bi darê zorê diçin rojavayê Tirkiyeyê, li bajarê Denizliyê dijîn: "*Qasî 15 salan em li Denizliyê man. Ez li wir hatime dinê. Em li wir wek bendeyan (esîr) dijîyan*". Cevdet Çokdil gotinên xwe paşê wiha bi dawî tîne: "*Giyane (rûh) Biroyê Heskê Têlî niha li Çiyayê Agiriyê dijî. Ev çîrûskêk bû. Ew çîrûskê bû agir*".¹⁸

* Wêneyê Biro Heskê Têlî jî nivîseke lêkolîner Garabet K. Moumdjian hatiye girtin Binihêre: Uluslararası Suçlar ve Tarih / International Crimes and History, nr 19 (2018).

Çavkanî:

- 1- Rohat Alakom, Xoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması, Avesta Yayınları, 2011, rûp.123-129.
- 2- Rohat Alakom, Çok Şey Anlatan Bir Fotoğraf: Biroyê Heskê Têlî, Malpera Nupelnetê (8/2 2020).
- 3- Di nota wêne de ev nava wek "Zeynal Bey" derbas dibe.
- 4- General İhsan Nouri Pasha, La Revolt de L'Agri Dagh, 1986, rûp.34.
- 5- Garo Sasunî, Kürt Ulusal Hareketleri-Ermeni Kürt İlişkileri, çev. Bedros Zartaryan, Memo Yetkin, 1986, Orfeus, rûp. 200 û rûp. 244.
- 6- Ağrı İsyanı Nasıl Çıktı?, Vatan Gazetesinin Memleket İhaveleri (Ağrı İlavesi), 21/1 1953.
- 7- İhsan Nuri, Ağrı Dağı İsyanı, 1992, Med Yayınları, rûp.91.
- 8- Rosita Forbes, Kvinnor som kallas vilda, 1935, rûp.118.
- 9- Rosita Forbes, rûp.118.
- 10- Garo Sasunî, rûp.200.
- 11- Garo Sasunî, rûp.200.
- 12- Husrev Gere de, Siyasi Hatıralarım, 1953, rûp.153.
- 13- Rohat Alakom, Di Kovara Hawarê de Serhildana Agiriyê, Malpera Riya Teze (7/12 2018).
- 14- Cegerxwîn, Şehname Şehidan, Hawar, nr 19/1933.
- 15- Osman Sebrî, Ağrı, Hawar, nr 36/1941.
- 16- Yılmaz Çamlıbel, Biro-Romana Serhildana Agiriyê, Weşanên Deng, 2000.
- 17- Mehmet Gültekin, Zargotina Kurdên Serhedê, 2013, Avesta, rûp.323.
- 18- Berzan Güneş, Biroyê Heskê Têlî'nin Hikayesi. Özgür Politika, 28/9 2018.